# Şerê azadî roj bi roj gird beno

PKK çaxdaş yew mîlad o. PKK rihê, keda şehîdan o. PKK senîhewa sazbi? Çi keda reyde virazîya? Ney ra, dîroka PKK'î zaf muhîm o. Biyayîşê PKK'î tepkîya yew gûrûba amator bi. 1975'ê nîsanî de, Enqera de pingara/baraja Çûbûklî de yew gûrûbê kurdîstanî kom bî. 1974, 75, 76'an de, di bindê gurûba ADYOD'î de xebata xo avera berdê...

*Nivîsa Zaza CEBELÎ R.8*

# Jinên kurd bûn xwedî îrade

**Bi PKK'ê re di civaka kurd de guhertinên mezin pêk hatin. Bi taybetî jin bûn xwedî îrade û rêxistinên xwe yên xweser ava kirine**




Bi damezirandina PKK'ê li Kurdistanê serdemeke nû dest pê kir. Bi taybetî jî jinên kurd bi damezirandina PKK'ê heta îro di nava têkoşînê de gav bi gav bi pêş ketin û di civakê de guhertinên mezin afirandin. Îro têkoşîna hebûna jinan bi PKK'ê re bûye têkoşîna hebûna civakê... *RÛPEL - 7*



# Cejna Vejînê bi çalakiyên cuda tê pîrozkirin

Gelê kurd Cejna Vejînê û damezirandina PKK'ê bi çalakiyên cuda pîroz dike. 32'yemîn salvegera damezirandina PKK'ê li Şirnex, Êlih, Edene, Dêrsim û gelek welatên Ewropayê bi girseyî hate pîrozkirin. Di pîrozbahiyan de li ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan axaftin hatin kirin û hate xwestin ku gelê kurd li hemberî vê yekê hişyar be. Li navçeya Silopiya Şirnexê salvegera damezirandina PKK'ê bi beşdariya bi hezaran kesan hate pîrozkirin. Di çalakiyan de gelê kurd dilsoziya xwe ya ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û PKK'ê anîn ziman û xwest rewşa Ocalan bê serastkirin... *RÛPEL - 4*


# ROJEV

29 Mijdar - Yekşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 17


## Mijdar û avzan

27'ê Mijdarê, dîsa hate silavkirin li her derê. Gul vebûn, sosin şad bûn, bilbil xweşhal bûn. Dîsa siwarên ronahîparêz bi rê ketin, gihîştin Amedê, Deşta Fîsê. Li halê 'mija daran' pirsîn, li halê çîrokên ku ji destên dayikan dirijiyan… Wek avzanan ketin rê dîsa. Şoreşgerên welatê me. Tevî ava ramûsan, tevî ava nasiyan, tevî ava zelal kirin...

MIZGÎN RONAK R.2



## Li Sûriyeyê 31 roj in di grevê de ne

Hikûmeta Sûriyeyê ji her alî ve zext û zorên li ser kurdan girantir dike. Ji ber zextan girtiyên girtîgeha Edrayê ev bû 31 roj in ku dest bi greva birçîbûnê kirin û rewşa çalakgeran nebaş e...

CÎHAN R6

## Şahid R.A. îfade da dozgeriyê

Şahidê îşkenceya 8 kesên li navçeya Pasûrê ya Amedê di gora tomarî de hatin dîtin, îfade da dozgeriyê. R.A. got ku li YÎBO'ya Licê îşkence li wan kesan kirine û piştre cilên gerîla li wan kirine û ew birine çiyê.

NÛÇE R3



## 'Şertên vegerê çênebûne'

Endamê Koma Aştiyê ya Mexmûrê Nîzar Buldan got ku banga hikûmetê ya ji bo vegera Mexmûrê heye, lê beriya mexmûrî vegerin divê şertên wê bên avakirin û daxwazên wan bi cih bên...

NÛÇE R2

# 'Bila heyetek biçe Îmraliyê'

**Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan der barê rewşa tê de ye de got ku ew xistine çala mirinê. Li ser vê rêxistinên mafên mirovan xwestin heyeteke serbixwe biçe Îmraliyê. Gelê kurd nerazîbûnên xwe anîn ziman û got 'AKP bi agir dilîze'**



*Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancî*

### 'DIVÊ LÊKOLÎN BÊNE KIRIN'

Piştî parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan diyar kirin ku mercên Ocalan bi neqilkirina Girtîgeha Tîpa F ya Îmraliyê re girantir bûne û tecrîda li ser Ocalan zêdetir bûye, rêxistinên mafên mirovan bertek nîşanî vê yekê dan û xwestin lêkolîn bê kirin.

### 'DIVÊ EV PEKANÎN NEYÊN QEBÛLKIRIN'

Seroka TÎHV'ê Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancî, xwest ku heyeteke serbixwe biçe li Îmraliyê lêkolînan bike û wiha got: "Ev pêkanîn li ser Ocalan hilweşîna fîzîkî û ruhî pêk tîne. Ev pêkanîn li dijî hiqûq û peymanên navneteweyî ye. Ev yek ji aliyê tu kesî ve divê neyê qebûlkirin."

### ÎHD: REWŞ PIR CIDÎ YE

Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan jî anî ziman ku piştî parêzerên Ocalan têkildarî rewşa muwekîlê xwe agahî dan û şûnde ew dê serî li rayedar û Wezareta Dadê bidin. Turdogan diyar kir ku rewş pir cidî ye û di demeke nêz de divê heyeteke serbixwe biçe Îmraliyê... *RÛPEL - 5*



## Li Licê AKP hate hişyarkirin

*Di Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Fîsê ku ji aliyê dewletê ve hat qedexekirin de bi hezaran kes li navçeyê hatin cem hev û zext û tercîdên li ser Ocalan şermezar kirin. Parlamenter Gultan Kişanak anî ziman ku ev tecrîda giran a li ser Ocalan provokasyon e, bila AKP gavan bi baldarî biavêje û gelê kurd dê van provokasyonan bi çalakiyên xwe pûç derxe... RÛPEL - 4*

## 'AKP bi agir dilîze'



Cigirê Serokê rêxistina DTP'ê ya Amedê Cafer Kan der barê girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan de bertek nîşan da û wiha got: "Gelê kurd dibêje dest bi hin nirxên min nedin. Birêz Ocalan yek ji wan xetên sor ên kurdan e. Destdirêjkirina van xetên sor tê wateya qiyametê, AKP bi agir dilîze. Divê her kes hişê xwe bide serê xwe. Em pêkanînên bi vî rengî bi tundî şermezar dikin."... *RÛPEL - 5*

## Li Qoser, Nisêbîn û Dêrikê meş

Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê, şertên tecrîd û îzalasoyona li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, zextên li dijî kurdan û DTP'ê bi daxuyaniyekê hatin şermezarkirin. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku gelê kurd bi Ocalan ve girêdayî ye û van pêkanînan qebûl nakin. Her wiha li navçeyên Qoser û Dêrikê jî bi boneya balê bikişînin ser şert û mercên Ocalan yên Girtîgeha Îmraliyê daxuyanî dan çapemeniyê û xwestin ku şertên Ocalan bên serastkirin.

# ‘Şertên vegerê çênebûne’

**Endamê Koma Aştiyê ya Mexmûrê Nîzar Buldan li ser banga hikûmetê ya ji bo vegera Mexmûrê got ku bo mexmûrî vegerin divê şertên wê bên avakirin û daxwazên wan bi cih bên**

Endamê Koma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ya Mexmûrê Nîzar Buldan, diyar kir ku ji bo gelê Mexmûrê karibe vegere Tirkiyeyê divê berî her tiştî daxwazên gelê Mexmûrê bi cih bên.

Malbata Nîzar Buldan di sala 1994’an de ji ber zext û zordariya dewleta tirk ji Geverê çûn başûrê Kurdistanê. Li wir jî zext û zordarî bi dawî nebûn. Hê jî zext û zordariya desthilatdaran didome. Buldan, der barê pergala jiyana Wargeha Mexmûrê wiha vegot: “Li gorî min di cîhanê de pergala jiyanê ya demokratîk û mînak Mexmûr e. Dibe ku nav kampa penaberan e, lê standartê wê yê demokrasiyê di asta herî jor de ye. Jiyanek demokratîk û komunal heye. Pergala demokratîk ji hemû cîhanê re mînak e. Meclîsa gel heye. Tax û semt heye. Her kes nûnerê xwe li tax û semta xwe hildibijêre. Meclîsa Taxê heye. Meclîsa giştî jî heye. Meclîsa Gel navenda biryarê ye. Nûnerên şaredariyê hene. Nûnerê çapemenî, çand û dibistanê heye. Hemû saziyên li wargehê hene nûnertiya wan di meclîse de heye. Vîna her kesî esas tê girtin. Pergalek herî demokratîk û komunal hatiye rûniştandin.”

Buldan, der barê armanca hatina wan a ji Mexmûrê got ku şert û mercên çûna wan a beriya 15 salan û niha pir cuda ye. Buldan, axaftina xwe wiha domand: “Di 15 salan de hin tişt hatin guhertin. Li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku got li Tirkiyeyê siyaset xitimiye, me jî xwe amade kir û biryar da. Ji ber ku li Tirkiyeyê siyaset pir teng tê meşandin. Êdî ji ber siyaseta Tirkiyeyê xitimîbû û piraniya Tirkiyeyê aştî dixwest pêdivî bi pêngavek bi vî rengî hebû. Derketina ji tirsa şer û hatina bi heviyên aştiyê tiştên pir pir cuda ne. Ev yek pir keyfxweşiyê dide mirov. Em hêvîdarin ku ew heviyên ku em pê hatine û daxwazên ku me dabûn pêşiya xwe dê bi cih werin. Ji bo vê yekê jî em dê di nava hewildanan de bin. Em di zanebûn û giraniya hatina xwe û armanca xwe de ne. Ji bo civaka Tirkiye û Kurdistanê çi bikeve ser milê me, bi taybetî ji bo gelê Mêxmurê çi têkeve ser milê me em dê bikin.

Buldan, der barê banga hikûmetê ya ji bo vegera Mexmûrê wiha got: “Gelek caran hikûmet û derdorên hikumetê bang dikin û dibêjin bila Wargeha Mexmûrê bê Tirkiyeyê. Başe bila vegere, lê dê çawa vegere? Binesaziyek çawa amade kiriye ji bo vegerê? Dê bibe bersiva daxwaza gelê Mexmûrê? Bi hezaran welatiyên ku bi zorê ji gund û warên xwe dûr ketin dê çawa werin? Pirsgirêka herî mezin xwendekarên wir in. Tev xwendekarên zanîngehê 5 hezar xwendekarên Mexmûrê hene Tirkiyeyê ji bo vê yekê çi bingeh ava kiriye? Di makezagonan de çi guhertin çêkiriye? Gelo dê karibe daxwazên xwendekaran û welatiyên Mexmûrê bi cih bîne. Piştî ku welatiyên Mexmûrê hatin dê karibe pirsgirêkên wan li vir çareser bikin? Ev bangawaziyên ku têne kirin ji rastiyê dûr in. Ji ber ku heta niha di warê vegerê te tu bingeh nehatiye avakirin. Divê ji bo hemû xwendekaran di warê qanûnî de guhertin çêbibe. Ger ku derfetên xwendina kurdî tune be. Dê ew xwendekar çawa vegerin. Welatiyên Mexmûrê kes bi tirkî nizane. Ger ku wisa be dê çawa xwendina xwe li vir dom bike? Divê qanûn bê guhertin. Tenê bi bangê pirsgirêk çareser nabin. Ji ber ku tiştekî hatiye guhertin tune. Li Mexmurê pergalek pir demokratîk heye. Perwerdehiya xwe dibîne. Xwe bi rêxistin dike. Divê derfetên wekî pergala Mexmûrê bêne amadekirin. Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay dibêje ji bo vegera Maxmûrê em amadekarî dikin. Gelo çend zagon guhertine. Gelo çiqas bingeh ava kiriye. Li aliyê din kesên ku çûn ji her malê windayekî wan heye, Kesekî wan hatiye kuştin. Divê vegerek bi rûmet be. Divê daxwazên wan bi cih werin. Divê pirsgirekên wan bê çareser kirin. Ji ber vê yekê jî divê berî her tiştî di warê zagonî de guhertin çêbibin.” **AMED (DÎHA)**



# Pirsgirêka kurd golek avê be Mexmûr dilopek ji wê avê ye

**BEDRAN PENABER**

Piraniya penaberên kampa Mexmûrê li sala 1994'an ji ber zilm û zordariya dewleta tirka stemkar, dest ji mal û halê xwe, pez û rezê xwe berdan ku nebine qurbana guleyên kujêrên dewletê, rep û rût, tevî xêzan û zarokên xwe naçarî malwêranî, koçberî ya Başûrê welat bûn.

Her li Başûr jî dewleta tirk bela xwe ji wan venekir û lîstikên xwe yên gemar, bira bi bira dana kuştinê domand. Li Başûr jî malên wan naçarî barkirinê dikin. Dema dibêjim mal barkirin, dibe mal û hal, nivîn û doşek bên bîra we. Lê digelek koçên demsala zivistanê da, berde nan û xwarin, cihê ku xwe, zarokên xwe lê bistêrin jî nebû û gelekan ji birsa, jiber sar û seqemê jiyana xwe ji dest dan... û gelek zarok ji bê şîrî di hembêza dayikên xwe de heta dawiyê nivistin û tu caran ranebûn...

Lê penaberên Mexmûrê tu caran pişta xwe nedan azadiyê û serê xwe li hember stemê neçemandin. Her çende ku dewleta tirk bi riya Neteweyên Yekbûyî (NY) û hêzên navendî dixwest wan bixapîne, ji nirxên wan dûr bixe, lê bi serneket. Ji ber miletê Mexmûr fêrî fen û fûtên dewletê bûbû .

Bi ser ew qas berxwedan û xweragirî re dewleta tirk di van demên dawî de bi sifreyeke pûç dixwaze serî li dek û dolabên xwe yên dîrokî bide kampê vala bike. Xwedê giravî rewşa Tirkiyeyê baş bûye, televizyoneke neqanûnî, mafê bi kurdî di mala xwe de axaftinê, nizanim çi û çi... weke xanîtokên zarokan, sibê çêkin êvarî xira bikin. Ji vê jî diyar e dewleta tirk hêj bi çavekî biçûk li kurdan temaşe dike û dixwaze bi rûmeta wan bilîze. Diyar e dewletê ji dîrokê, ji sêdaran, ji Şêx Seîd, ji Seyîd Riza û ji koçberiya Bedirxan Beg, Yezdîn Şêr... ders wernegirtiye.

Ma di vê rewşê de penaberên Mexmûrê wê çawa vegerin gund û bajarên xwe? Hêj li Tirkiyeyê xeberên kujêrên faîlên wan nediyar, şer û operasyon... berdewamin.

Ger Tirkiye bixwaze penaberên Mexmûrê vegerîne, divê dest ji van kiryarên dij kurdan berde û bi şêweyekî rastgo , dadî pirsgirêka kurd bi kurdan re çareser bike. Nexa serê xwe êşandina bi derve re çareseriyê nayîne, berovajî birîna kûrtir dike.

Çunkî penaberên Mexmûrê weke dilopek ji ava golê parçeyekî biçûk in ji pirsgirêka gelê kurd re.

Li gorî vê; divê di serî de çi mafên ji bo yekî tirk heyî ji bo yekî kurd jî bi şêweyekî yasayî bê pesendkirin. Bi deng û rengê xwe yê kurdînî (nasname, bi zimanê dayikê perwerde û vekirina derfetan ji bo pêşxistina çand û huner û edeba kurdî.)

Efûyeke giştî ku hemû kurdan bigire nava xwe, rakirina sistema cehşîtî ku niha jî ew kujerane bi şêweyekî fermî di wezîfeyên dewletê de ne û dana zirer û ziyanên maddî yên gund û bajarên wêrankirî. Ango bi kurtî xwe rêvebirinekî xweser û demokrat. Ha, dema em dibêjin xwe rêveberiyekî demokrat ne welatekî cuda; welatekî hevpar ku her kes bikaribe cewherê xwe, hizir û bîrên xwe tê de bibîne û bijî. Palpişta vê bîrdoziyê jî ku serkaniya xwe ji pergala rêveberiya KCK' ê digire mafê herî rewa û sirûşti yê mirovane.

Divê ev jî neyê jibîrkirin; bêyî PKK’ê gotinên çareserkirina pirsa kurd pûç û bêkêr in. Jiber ku PKK û sistema KCK'ê hêza parastina rewa, nasnameya azadiya gelê kurd e. Ji derveyî vê, ji derveyî doza azadiyê gelê kurd, gelê Mexmûrê tu caran qebûl nake. Ji ber ku gelê penaberê Mexmûrê di nav sîstema azadiyê ya KCK'ê de bişkiviye û ew ber bi hemdembûna vê sistemê diçe.



**Mizgîn Ronak**

## Mijdar û avzan

27’ê Mijdarê, dîsa hate silavkirin li her derê. Gul vebûn, sosin şabûn, bilbil xweşhal bûn. Dîsa siwarên ronahîparêz birê ketin, gihîştin Amedê, Deşta Fîsê. Li halê ‘mija daran’ pirsîn, li halê çîrokên ku ji destên dayikan dirijiyan… Wek avzanan ketin rê dîsa. Şoreşgerên welatê me. Tevî ava ramûsan, tevî ava nasiyan, tevî ava zelal kirin. Avzan bûn lewre, bi halê avê dizanibûn. Didîtin ku kîjan av ji ku tê, li ku dicive, li ku dibe çem, li ku dibe golek bêdeng… Li halê avê pirsîn, derdê wî hîn bûn, dîtin ku kîjan av ji kîjan ewran tê, ji kîjan keseran. Kîjan av, kengî ziwa dibin û mirov û xwezayê dikin çol. Avzan bûn ew, avê nasiyan, avê bi rê xistin, bi avê re geriyan, li taxan û gundan, li navçe û bajaran. Di tariyên şevan de çeng bi çeng çirûsk belav kirin ji dilên xwe.

Mijdar bû. Amed. Licê bû. Li ava qeşagirtî geriyan, dîtin û qeşaya avê bi roniya çavên xwe helandin. Avê bi rê xistin, peyvên xwe ji avê re gotin û ji şevan derbas bûn, di giraniya xewa şêrîn de. Li ber her deriyê gulek danîn, li ber her şibakê çîrokek. Li her malê rihanek çandin, li ber her rihanê berfînek danîn ku tu qereqol nedihiştin li mêjiyan. Berê xwe dan şefeqan, li her şefeqê stranek gotin, li dora her stranê navek nivîsandin bi dilopên xwîna xwe.

Serma bû, birçî bûn, tazî bûn, tu stare nîn bû. Lê dîsa meşiyan ji neçariyan çare, ji çareyan serhildanan afirandin. Gihîştin deştên zer. Deştan bi çemên dilê xwe yê avzan kesk kirin. Gihîştin avzanan, bask çêkirin ji çîrokên şivan û bêrîvanan re.

Şevzan bûn, didîtin ku şev, çima û çawa naqede, çavên xezalan bo çi bêkil mane, av bo çi xeyîdîne. Şevzan bûn, her ku canê xwe dan hînê ronahîkirina şevê bûn. Her ku birçî, pêxas û qerisî man; hînê biharan bûn û wan biharan, bi xeyalek Mazlûm û Egîd ve di paşila xwe de veşartin. Bi tiliyên xwe çiya parastin, kevir û zinar parastin bi tiliyên xwe yên parçekirî! Singên wan, li ser çiyayan û newalan parçebûyî man, kes li bedenên wan xwedî derneket, dilop bi dilop heliyan. Lê venegeriyan, lê nesekinîn. Tu car soza xwe bernedan, Dêrsim û Agirî, Geliyê Zîlan û Helepçeyê jibîr nekirin.

Gotin ku em nehatin, ku em nema karibin werin jî, bendewar bin em ê werin. Bi rastî jî hatin, dane pey hev û hatin, her ku çû zêde bûn. Bajaran çêkirin bi zanîna xwe. Dilê xwe bi ava gulan şûştin, golên qirêj li pey xwe hiştin, bi pey ava qirêj neketin. Avzan bûn, dizanîbûn ku kîjan av zexel e, difetisîne, dest nade ronahiyê. Lê baş dizanîbûn kîjan av jiyan e, zelal e. Berê xwe ji ava zelal nezivirandin, çavên xwe her ronahî hiştin, gotin; “ku em bimirin nebînin jî dê zarokên Kurdistanê bibînin, ev jî bes e ji me re!” Meşiyan, bi bextewariya zarokên pêşerojê bextewar bûn, ji mirinê qet netirsiyan, ji bo hevalên xwe xilas bikin canên xwe dan. Canê hev rizgar kirin. Dizanîbûn ku canê yekê/î ji wan, yê tevan e. Bi çavên qirêj û zexel li hev mêze nekirin, destên xwe li ber baranê vekirin. Li ber siya spîndaran xewnereşkan çirandin. Şehîdên xwe di dilê xwe de veşartin. Avzan bûn ew, avê şiyar kirin û şoreşê anîn welatê me. Niha her kes bûye avzan. Hezar silav li pêşengên avzaniyê!

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA **Yaygın Süreli Yayındır**

www.arsivakurd.org



## Celaliyanê alîkarî xwest

**Zeynep Celaliyan a kurd a ku dewleta Îranê cezaya îdamê lê birîbû ji rêxistinên mafên mirovan re name şand. Zeynep Celaliyan diyar kir ku dê piştî demekê cezayê wê bê înfazkirin ji ber vê yekê jî alîkarî xwest. Li ser banga Celaliyanê Hewldana Jinan a ji bo Aştiyê kete nava tevgerê û ji bo ku îdam bê rawestandin dê serî li Rêxistina Efûya Navneteweyî bide û kampanya bide destpêkirin.**

**Li Îranê cezayên îdamê yên li hemberî kurdan û jinan di 2 salên dawî de her diçe zêditir dibe. Herî dawî parasvaneke mafên mirovan jî rastî cezaya îdamê hat. Demeke berê dadgeha herêmî der barê Parazvana mafên mirovan Zeynep Celaliyan de biryara cezaya îdamê da. Cezaya Celaliyan ji aliyê dadgeha Bilind a Îranê ve hate êrekirin. Celaliyan bi riya malbata xwe di 26'ê mijdarê de ji rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên jinan re nameyek şand û alîkarî xwest.**

**Zeynep Celaliyanê di nameya xwe de wiha got: "Ez jineke kurd a 27 salî me. Li girtîgeha Îranê de, girtiyeke siyasî me. Cezaya îdamê ya ku der barê min de hatiye birîn ji aliyê Dadgeha Bilind a Îranê ve hate êrekirin. Ez niha di bin şert û mercên xirab de têm girtin. Her tim îşkence û muameleyên xirab tê kirin. Qaşo darizandinek hate kirin. Di nava çend deqîqeyan de bê parêzer cezaya îdamê li min birîn. Parêzereke ku min biparêze tune ye. Danişîna ku ez hatim darizandin tenê çend deqîqe berdewam kir. Dadgehê ji men re got 'tu dijminê xwedê ye û wekî dijminê xwedê yên din tu dê bê îdamkirin.' Hemû dadgeran ji bo ku ez bêm îdamkirin biryara xwe dan. Ji bo ku xatir ji malabata xwe bixwazim min ji dadger destûr xwest. Lê dadger bi gotina 'neaxive, devê xwe bigire' bersiv da min. Daxwaza min red kir. Daxwaza min ew e ku hemû parazvanên mafên mirovan û jin li hemberî vê neheqiyê derkevin û alîkariya min bikin."**

**Dê kampanya dest pê bike**

**Li ser banga Zeynep Celaliyanê Hewldana Jinan a ji bo Aştiyê kete nava tegerê. Dê ji bo biryara îdamê bê rawestandin serî li Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî bidin. Ji bilî vê yekê jî dê li Tirkiyeyê ji bo Celaliyanê kampanya bidin destpêkirin.** ***STENBOL***

# Ji ber sendroma Kurdistanê meaş

Dadgeha Idarî ya Leşkerî ji bo leşkerê ku li navçeya Çelê ya Colemêrgê di encama pevçûnê de psîkolojiya wî xira bûye biryara meaşdayînê da.

Leşkerê bi navê S.A ku li qereqola sînor a Çelê leşkerî dikir di encama operasyonên li hemberî gerîlayên PKK'ê de psîkolojiya wî xira bû. Piştî ku leşkeriya wî qediya 2 şûşe kolonya vexwar. Der barê wî de teşhîsa "nexweşiya wî di encama leşkeriyê de derketiya holê" hati kirin. Her wiha teşhîsa ji sedî sed nikare bişixule hate kirin.

Dayika S.A'yê serî li dadgehê da û xwest meaş bê dayîn. Dadgehê ev daxwaz red kir. Li ser vê yekê daxwaza rawistina biryarê hate kirin. Dadgeha Îdarî ya Leşkerî biryara "pêywira di artêşê de bûye sedama nexweşiyê " da. Ji ber vê yekê jî biryara dayîna meaşê hate dayîn.

Xirabûna psîkolojiyeya di encama travmayê de bi taybetî li herêmên şer û pevçûn lê hene diqewime.

Li Amerîkayê piştî şerê Vîetnamê psîkolojiya gelek leşkeran xira bû. Ji ber vê yekê jî ev nexweşî wekî "sendroma Vîetnamê" hate binavkirin. Ev nexweşî li Tirkiyeyê jî kesên ku leşkeriya xwe li Kurdistanê dikin de derdikeve holê. Bi taybetî di demên dawî de kesên ku li Kurdistanê leşkeriyê dikin de bûyerên întiharê zêde tê dîtin. Her wiha di demên dawî de li Iraq û Afganistanê jî ev nexweşî zêde têne dîtin. **ENQERE**

# 'Li YÎBO'yê îşkence li wan kirin'

**R.A'yê ku bûbû şahidê 8 kesên ku li Licê bi îşkenceyê hatine qetilkirin îfade da dozgeriyê. R.A. got ku li YÎBO'ya Licê îşkence li wan kesan kirine û piştre cilên gerîla li wan kirine û ew birine çiya. Lê piştre agahî ji wan negirtine**

Şahidê îşkenceya li 8 kesên li navçeya Pasûrê ya Amedê di gora tomarî de hatin dîtin, hatiye kirin, îfade da Dozgeriya Komarê ya Pasûrê. Şahidê bûyerê, R.A. diyar kir ku bi wan kesên hatine qetilkirin re li YÎBO'ya Licê ya ji hêla tîmenên taybet û Tugaya Komandoyên Boluyê ve wekî îşkencexaneyê dihat bikaranîn mayîne û li wir bûye şahidê îşkenceya li van kesan hatiye kirin. R.A. got ku herî dawî kincên şervanan li van kesan hatine kirin û ew birine.

Fermandariya Cendirmeya a Licêyê, Tuga Komandoyê ya Çiyan a Boluyê ya di bin serokatiya Tumgengeral Yavuz Ertuk de bi beşdariya cerdevanan di 13'ê gulana 1994'an de di ser gundên Entax û Cêmarê yên Licê de girtî bû. Di serdagirtinê de Mezraya Cêmarê ya 80 mal hate şewitandin. Piştî kontrola nasnameyan gelek gundî hatin binçavkirin. Lê cardin agahî ji 8 gundiyên hatina binçavkirin agahî nehat girtin. Piştî salan derket holê ku 8 kes piştî hatine qetilkirin, di gorek tomarî de hatine definkirin. Li ser vê yekê ÎHD'ê ji bo vekirina gora li mezraya Tuzpelîta gundê Bagcilara navçeya Pasûrê di sala 2003'yan de serlêdan kir. Pişti hestiyên 8 kesan hatin derxistin ji bo testa DNA'yê hestî şandin Saziya Tipa Edlî ya Stenbolê. Li gorî testên encama wan di 2006'an de kişf bûn derket holê ku hestî aîdî ji 5 endamên malbata Bulut, Alî Bulut, Ekrem Bulut û Ramazan û endamên malbata Ferdî Hasan û i Mehmet Selîn Orhan ên wê demê hatine binçavkirin in.




**Şahid îfade da dozgeriyê**

Piştî mijar di çapemeniyê de derket, welatiyek bi navê R. A. serî li ÎHD'a Amedê da. Şahid diyar kir ku kesên hestiyên wan derketine herî dawî wî dîtiye. ÎHD'ê şahid R.A. arasteyî Dozgeriya Komê ya bi Rayeya Taybet a Amedê kir. R. A. li dozgeriyê wekî şahid ev îfade dan: "Di 22'yê gulana 1994'an de ji Tugaya Komandoyê ya Çiya ya Boluyê leşker hatin gund. Bi hinctea me alîkariya PKK'ê kiriye, xwestin em tiştên xwe derxin ji derve. Piştre hemû gundî derxistin derve. Eyşayên me şewitandin. Piştre bi boneya dermanceyek 300 metreyan durî mala min hatiye dîtin a aîdî H.A., ez, Ş. A. H. A. û S. A. binçav kirin. Em birin dibistana leylî ya ji salên 90'an pêve ji hêla tîmenên taybet ve dihat bikaranin. Piştre kurmamên min birin Fermandariya Cendirmeyan a Navendî ya Licê. Ez xistim banyoyek mezin. Li vir Hasan Cezayîr û Mehmet Selîm Orhan jî hebûn. Her wiha Ekrem, Remezan û Alî B ulut, Şemsetîn Koç, kesek bi navê Ramaza nku min paşnavê wî nezanî û kesek din min nas nedikir ji Edîrneyê hebûn. Em 10 kes di binçavan de bûn."

**'Kincên şervanan li wan kirin'**

Şahid R.A. daxuyand ku piştî Hasan û Mehmet Selîm Orhan anîne di heman şevê de birine cihê îşkenceyê yê nîzîkî wan. Dema îşkence li Hasan Orhan dikirin diqêriya ji leşkeran re digot ku kurê wî jî leşker e. Ez jî hildam îşkenceyê. Hemû cure îşkence dikirin. Ez 19 rojan di binçavan de mam. Şevekê leşkerên hatine cihê em lê çavên me girêdan. Piştre hin kes birin. Piştî seatekê cardin hatin çavên me vekirin tenê ez, Ramazan û Şemdîn Koç mabûn. Piştre min xwest ez biçim tuvaletê. Dema ez birim tuvalekê min li ber tuvalekê Cezaîr dît. Diyar kir ku kincên şervanan li wan kirine û dê wan bibin çiyan, piştî bikişînin kamerayê dê serbest berdin. Bes dema ev tişt gotin digiriya û xwest ku dema ez serbest hatim berdan ez malbata wî agahdar bikim. Kincên şervanan li yên din jî kiribûn. Ez cardin vegeriyam cihê em lê dihatin girtin. Seat li derdora 07.00'an min ji leşkeran pirsî gotin birine. Cardin jî min ew nedîtin. Piştre ez û Şemdîn Koç birin Fermandariya Navendî ya Licê. Dema em birin kurmamên min jî li wir bûn. Ji ber dermanceyê ez hatim girtin û di 2000'an de ez derketim." R.A. diyar kir ku wê demê leşkeran rûtbeyên xwe bi singê xwe venekirine û ji ber wê yekê payeya wan kesan nizane. Piştre derket holê ku demek berî niha hestî di navbera Dozgeriya Komarê ya Licê, Saziya Tipa Edlî ya Stenbolê û PTT'ê de winda bûne. ÎHD dê têkildarî mijarê giliyê bike. **AMED (DÎHA)**

# Dayikên Şemiyê: Em dev ji têkoşîna xwe bernadin

Dayikên Şemiyê ji bo ku berpirsyarên cînayetên kiryarên wan ne diyar bên dîtin cara 244'emîn li ber Lîseya Galatasaraya Stenbolê çalakî li dar xist. Dayikan diyar kir ku heta berpisyar neyên dîtin dev ji têkoşîna xwe bernadin.

Dayikan û xizmên windayan vê hefteyê jî pankarta "Bila aqûbeta kesên ku di bin çavan de hatine windakirin bê aşkerakirin û berpirsgiyar bên darizandin" vekirin û wêneyê kesên ku ji aliyê dewletê ve hatine windakirin rakirin. Di çalakiya vê hefteyê de çîroka windakirina Fehmî Tosun ê beriya 14 salan hatibû windakirin hate vegotin.

Di çalakiya vê hefteyê de Şerîf Taşdelen, Naîfe Yildiz, Huseyîn Ocak û parlamentera DTP'ê Sebahat Tuncel axivîn.

Naîfe Yildiz diyar kir ku ew bi salan e li benda riya kurê xwe ye. Yildizê got ku ew êşa herî mezin dijîn. Cejn tên ew nikarin biçin ser goreke. Ew tenê ber lîseya Galatasarayê.



**'Aqûbeta windayan çi bû?'**

Her wiha yildizê êrîşa li ser DTP'ê ya Îzmîrê ya li Çanakkaleyê li hemberî kurdan jî şermezar kir.

Birayê hasan Ocak, Huseyîn Ocak jî got ku divê li Tirkiyeyê aştiyeke bi rûmet pêk bê. Parlamentera DTP'ê Sebahat Tuncelê jî got ku Dayikên Şemiyê li ber Lîseya Galatasarayê rastiyeke tînin ziman. Tuncelê xwest ku aqûbeta windayan di demeke kin de bê aşkerakirin.

Piştre keça Fehmî Tosun, Jiyan Tosun daxuyaniya çapemeniyê xwend û got ku dema ku bavê wê hatiye qetilkirin ew 10 salî bûye. Jiyan Tosun ku cejn ji bo wan tê wateya hêrsa mirovî ye li hemberî kesên ku wan bê dê, bê bav, bê xwîşk û biraû bê zarok hîştiye.

Tosun bang li dozgerên Ergenekonê kir û pirsa gelo "lêpirsîn dê kengî bigîhîje kesên hatine windakirin" kir. Tosun got ku heta ew encamê negirin dev ji têkoşînê bernadin. **STENBOL**

# Li Cizîrê 2 kes hatin girtin

2 kesên li gundê Zavka Alîaxa ya bi ser navçeya Cizîra Şirnexê di serdagirtina malan de hatibûn binçavkirin, hatin girtin.

Leşkeran bi ser gundê Zavka Alîaxa ya bi ser Cizîrê de girtin û welatiyên bi navê Mesut Gokhan û Îbrahîm Kaya binçav kirin. Kesên hatin binçavkirin piştî pirsiyariyê derxistin Dadgeha Nobedar a Cizîrê. Dadgehê bi hinceta Gokhan û Kaya "Endamtiya Rêxistinê kirine" kirine biryara girtinê da. Fermandariya Giştî ya Tirkiyeyê di malpera xwe de îdia kir ku ev kesên hatine girtin gerîlayên HPG'ê ne. **ŞIRNEX**



# Ji bo tecrîdê hişyarî: Gavan bi baldarî biavêjin

**Di Mîhrîcana Fîsê ku ji aliyê dewletê ve hat qedexekirin de bi hezaran kesî biryar şermezar kir û tecrîda Îmraliyê ya li ser Ocalan şermezar kirin. Parlamenter Kişanak got tecrîda giran ya li ser Ocalan provokasyon e, bila AKP gavan bi baldarî biavêje**

Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Fîsê ku yekem car ji aliyê dewletê ve hatibû qedexekirin li pêşiya avahiya navçeyê ya DTP'ê bi beşdariya bi hezaran kesî ve hat şermezarkirin.

Heyeta ku ji Amedê hatibû ya ji serokê DTP'a Amedê Firat Anli, cîgirê serokê koma DTP'ê parlamenter Gultan Kişanak, parlamenterê DTP'ê Hamît Geylanî, şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu, şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn, şaredara Baglarê Yuksel Baran, nûnerên saziyên sivîl li pêşiya DTP'a Licê bi coşeke mezin hatin pêşwazîkirin. Her wiha Dayikên Aştiyê, xwişka Hayrî Durmuş Zekiye Durmuş, bavê Mazlum Dogan Kazim Dogan û dayika wî Kevire Dogan û xwişka Aladdîn Zogurlu Pîroze Zogurlu hatin Licê. Malbatên Durmuş, Dogan û Zogurlu da zanîn ku ji bo damezirandina PKK'ê pîroz bikin hatine Licê.

**'Gêlê Licê gelekî bi rûmet e'**

Şaredara Licê Fîkriye Aytîn bertek nîşanî destûrnedayîna mîhrîcanê da û şermezar kir. Piştî Aytîn serokê DTP'a Amedê Firat Anli bi pîrozkirina cejnê ve dest axaftinê kir û wiha got: "Gelê Licê gelekî bi rûmet û qehreman e. Di nav şerê 30 salî de gelek zilm dît lê tu rojekî jî serî netewand. Lîcê hat şewitandin. Mirov hatin kuştin, koçber bûn lê heta îro tu caran teslîm nebû. Gelê Licê ji nasname û rûmeta xwe xwedî derket îro jî xwedî derdikeve. Anli bertek nîşanî qedexekirina mîhrîcanê da û wiha got: "Ji aliyekî ve dibêjin çareserî ji aliyê din jî mîhrîcanê qedexe dikin. Em paşve gav navêjin. Ji 7 salî heta 77 salî ev gel şiyar bûye. Îro gundê Fîsê qedexe dikin. Em 5 sal berê çûn. 30 sal berê jî çûn li vir û gundekî li ser rê kesek nikare qedexe bike."

**'Em destûrê naxwazin'**

Parlamenter Gultan Kişanak jî bertek nîşanî qedexekirina mîhrîcanê da û ev tişt gotin: "Em bangî kesên ku mîhrîcanê qedexe kirine dikin. Dema gelê kurd dest bi têkoşînê kir destur ji kesekî nexwest. Bi domkirina têkoşînê jî em desturê ji kesekî naxwazin. Kesên biryara qedexekirina mîhrîcanê dane malên gelê Licê şewitandin. Gundên wan şewitandin. Li hember zilm, zordariyê tu caran vî gelî dev ji berxwedana xwe berneda. Ji bo berxwedanê ji destur kesekî nexwest. Kesek nikare bibe asteng."

Kişanak bertek nîşanî zextên li ser DTP'ê da û wiha got: "Ji DTP'ê re dibêjin bila konvoyên we tunebin, mîtîngan li darnexin, qasidên aştiyê pêşwazî nekin. Bila DTP teslîm be. DTP xwe di avahiyan de heps nake. Dê bi tevî gelê xwe di qadan de be. Vî gelî gelek îktîdar dîtin. Lê tu gelekî nikaribû pêşiya têkoşîna vî gelî bigirin. Bila AKP hinekî dîroka kurdan ya nêz hîn bibe û dê bibîne kurdan çawa ber xwe dane."

**'Provokasyonan pûç derxin'**

Kişanak bal kişand rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ya Îmraliyê û wiha got: "Ger dewlet û AKP bixwaze aştî pêk were bila şertên girtîgeha Îmraliyê biguherinîn û bi dawî ji tecrîdê bînin. Ev tecrîda giran ya li ser Ocalan provokasyon in. Gelê kurd dê van provokasyonan vala derxe. Nedayîna parêznameyên Ocalan mînakeke bê hiquqiyêye. Bi bahaneya guherina şertên girtîgehê ew şandin tabuteke 6 metreqare. Bila AKP gavên xwe baldarî biavêje. Gelê kurd dê êrîşên li hember nirxên xwe û provokasyonan vala derxe. Bangî serokwezîr dikim, li vî welatî 50 hezar kesî jiyana xwe ji dest da bila kesek li ser wan siyasetê neke ev bê wijdanî ye. Bila ji bo gelekî ku dibêje rêberê me ye kesek tabutan çêneke."

Piştî axaftinan li pêşiya avahiya DTP'ê salvegera damezarindina PKK'ê bi şahî û govendan hat pîroz kirin. Heyet li vir çûn gundê Fîsê ku PKK li vir hatibû damezirandin û li vir dar çandin. **AMED**

## Ji bo Ocalan bi hezaran kes meşiya

***LI SILOPIYA*** Şirnexê salvegera damezirandina PKK'ê bi beşdariya bi hezaran kesan hate pîrozkirin. Piştî pîrozbahiyê bi hezaran kes meşiyan û bal kişandin li ser rewşa tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan.

Dİ pîrozbahiyê de posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alê PKK û KCK'ê hatin vekirin. Bê navber dirûşmên "Bijî Serok Apo", "PKK gel e, gel li vir e" hatin berzkirin. Jin bi cilên xwe yên neteweyî başdarî pîrozbahiyê bûn. Şaredarê Sîlopiyê Emîn balkişand li ser tecrîda li ser Ocalan jî û wiha got: "Me der barê rewşa tenduristiya Ocalan de agahiyek girt. Pirsgirêkên wî yên tenduristiyê zêde bûne. Ez li vir bang li Serokwezîr û Serokomar dikim. Ev bi agir dilîzin. Bila baldar bin. Ji bo birêz Ocalan bi dehan kesan xwe şewitand. Bila vê yekê her kes baş bizanibe. Ev pêvajoya aştiyê ye. Bila li ser van hesasiyetan tevbigerin."**ŞIRNEX**

# Li her derê vejîn hate pîrozkirin

Bi munasebeta 32'yemîn salvegera damezirandina PKK'ê li Şirnex, Êlih, Edene, Dêrsim û gelek welatên Ewropayê bi girseyî hatin pîrozkirin. Di pîrozbahiyan de li ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan axaftin hatin kirin û hate xwestin ku gelê kurd li hemberî vê yekê hişyar be.

**ÊLIH:** Li Êlihê, bi munasebeta 32'emîn salvegera damezirandina PKK'ê li gelek taxên Êlihê bi def û zirneyan pîrozbahî hatin lidarxistin. Bi hezaran kesên ku li Pazaryerî gihîştin hev, salvegera PKK'ê pîroz kirin. Polîsan li vir bi panzêran mudaxaleyî pîrozbahiyê kir û zarokekî navê wî nehat hînbûn birîndar bû. Hate hînbûn ku zarokê birîndar rakirin nexweşxaneyê. Li aliyê din li taxên Petrolkent, Baglar, Yavuz Selîm û Hîlal bi hezaran kes gihîştin hev û salvegera damezirandina PKK'ê bi hev re pîroz kirin. Girseyê di pîrozbahiyan de dirûşmeyên "PKK gel e, gel li vir e", "Bijî Serok Apo", "Bi xwîn, bi can em bi te re ne ey Serok" berz kirin. Pîrozbahiyê heta dergengiya şevê dom kir.

**CIZÎR :** Li navçeya Cizîrê jî bi hezaran kes li taxên Nûh, Cûdî, Sûr û Dagkapî civiyan û bi fîşekên hewayî salvegera PKK'ê pîroz kirin. Girseyê di nava taxan de li gel def û zurneyan govend girtin û dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "PKK gel e, gel li vir e" "Bêyî Serok Jiyan Nabe" berz kirin. Pîrozbahiyê deha derengê şevê dom kir.

**HEZEX:** Li navçeya Hezexê jî 27'ê mijdarê bi girseyî hate pîrozkirin. Bi seden kes li Qada Newrozê ya taxa Atakent bi def û zurneyan civîyan û 32'emîn salvegera damezirandina PKK'ê pîroz kir. Di pîrozbahiyê de Parlementerê DTP'ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan, Şaredarê Hezexê Resul Sadak, endam meclîsê û rêveberên DTP'ê amade bûn. Şahiya pîrozbahiyê heta derengê şevê bi fîşekên hewayî dom kir. Piştî pîrozbahiya komek ciwan li qada Adile Naşît civiyan û posterên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocolan, Mazlum Dogan vekirin. Komê piştre bi meşaleyan meşiyan û tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan şermezar kirin. Ciwanan pankarta "TAK" û "Slav ji Rêber Apo ku 27'ê mijdarê afirandiye" vekirin. Ciwanên ku serê xwe girtin û srûdên neteweyî xwendin meş pêk anîn û çalakiya wan heta derengê şevê dom kir.

**DÊRSIM:** Li Dêrsimê jî rêxistina DTP'ê salvegera PKK'ê pîroz kir. Pîrozbahiya ku li avahiya Rêxistina DTP'ê ya Navçeya Navendî pêk hat. Di pîrozbahiyê de Rêvebera DTP'ê ya Amber Bakiray diyar kir ku hîn polîtîkayên înkar û îmnayê yên li ser gelê kurd didome û wiha got: "Çi cara ku gelê kurd li hemberî zilm û zordariyê serî rakiriye rastî îmhayê û qetlîamê hatiye. Gelek mînakê vê yekê hene. Ji ber vê yekê divê em vejîna 27'ê mijdarê baş fam bikin û bi wate bikin." Pîrozbahî bi pêşandana sînevîzoyê bi dawî bû.

**EDENE:** Li taxa Şakîrpaşa, Barbaros û Gulbahçe yên Seyhanê û Taxa Anadolu ya Yuregîrê 32'emîn salvegera damezirandina PKK'ê hat pîrozkirin. Di pîrozbahiyên ku bi hezaran kes beşdar bibûn de posterên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û alên PKK û KCK'ê hatin vekirin. Di pîrozbahiyên ku piranî ciwan beşdar bibûn de bênavber dirûşmeyên "Bijî serok Apo", "PKK gel e, gel li vir e", "Ciwan fedaiyên Apo ne" û "Şehît namirin" hatin berzkirin. Li Semta Gulbahçe ya Seyhanê jî bi girseyî pîrozbahî pêk hat Li vir axaftin hatin kirin û hate xwestin ku pîrozbahî li gorî girîngiya rojê bê. Di axafatinan de hate xwestin ku kurd di nava tifaqiyê de tev bigerin û têkoşîn.**(DÎHA)**



# Li Ewropayê jî pîrozbahiyên damezrandina PKK'ê



Li paytexta Îngilistan London, li bajarê Toulouseya Fransayê û li bajarê Genka Belçîkayê salvegera 31'emîn ya damezrandina PKK'ê bi girseyî hate pîrozkirin. Li Londonê Komîsyona Ciwanên Brîtanyayê ku piraniya wan jin bû, bi girseyî pîrozbahî li dar xist. Girseyê piştî sînevîzyonê li dor agir bi def û zirneyê bi saetan dîlan hat girtin.

Pîrozbahiya Londonê dê îro jî bidome. Îro berya ku şahiya salvegerê bê darxistin ji bo tecrîda li ser Serokê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rabe xwpêşandana protestoyî tê li darxistin. Kurd îro saet 13'an de li ber Navenda Polîs a Wood bicivin û ji vir heta Navenda Civaka Kurd bimeşin.

Li bajarê Toulouseya Fransayê jî bi konvoyek salvegera 31'emîn ya PKK'ê hat pîrozkiri. Dema konvoy derbas bû fransiyan jî eleqe nîşan da û hin ji wan li şaneşînên xwe bi çepikên xwe piştgirî dan pîrozbahiyê. Belavodkên feransî hat belavkirin û salavegera 31'emîn a PKK'ê li hemû mirovahiyê pîroz kir. Konvoy di nav cihê herî qerebalix de derbas û û li navenda bajarê li qada Capîtol arwestiyan. Li vir li ser navê CDK'ê axaftin hat kirin.

Li bajarê Genka Belçîkayê jî bi şahiya şevê salvegera 31'emîn ya PKK'ê hat pîrozkirin. Şahî di pêşengiya Federasyona Komaleya Kurd a Belçîkayê (FEK-BEL) ve bi bişdariya hezar kesî pêk hat.
**LONDON / TOULOUSE / GENK**

*Krîza Dubaiyê bandorê li borsayê kir*

Dubaiyê ji ber dayina deynê xwe tengasî kişand. Ev bû krîzek û deng veda. Bandor li borsaya navneteweyî kir. Borsayên Ewropayê yên piştî di demeke kin de xwe dan hev û tedbîr girtin. Lê endeksên borsayên Asya û Amerîkayê her diçe kêm dibe. DUBAÎ

*13 afganî ji girtîgehê revîn*

Ji girtîgeheke bajarê Farah ê rojavayê Afganistanê 13 girtiyên ku mîlîtanên Talîbanê jî di nav de hene reviyan. Li ser mijarê lêpirsîn hat destpêkirin. Li gor hin angaştan hin qerdiyanan alîkarî dane girtiyên revîne. QABÎL



# Greva birçîbûnê ket roja 31'an!

**Hikûmeta Şamê ji her aliyê ve zext û zora li ser kurdan girantir dike. Ji ber van zext û zoran girtiyên girtîgeha Edrayê ev bû 31 roj in ku dest bi greva birçîbûnê kirin û hat gotin ku tenduristiya çalakvanan xirab bûye**

Greva birçîbûnê ya 300 girtiyên kurd ên li girtîgeha Edra ya paytexta Sûriye Şamê roja 30'ê cotmehê dest pê kiribû û duh 30 roj li pişt xwe hişt û ket roja 31'an. Agahiyên ku malbatên girtiyan û saziyên mafên mirovan radigihînin tenduristiya girtiyên kurd her diçe xirabtir dibe.

Girtiyên PYD'ê yên girtîgeha Edraya Şamê bi boneya zext û zorên li ser wan bên rakirin, astengiya ji bo hevdîtina bi malbatên xwe re bê hildan, rodyo û TV bidin wan des bi greva birçîbûnê kirin. Ev girtiyên kurd ji aliyê Dadgeha Parasitna Dewletê ve bi awayek bê hiqûq ceza li wan hatiye birîn û dadgehên Sûriyeyê bi kurdan hatiye dagirtin. Hemû mafên xwezahî yên girtiyan dewleta Sûriyeyê ji odestê wan standiye û heta ji hin girtiyan bi salan agahî naye girtin, hin girtî jî bi salan bê ku bên darizandin di girtîgehan da têne girtin.



Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (Human Rîghts Watch-HRW) li ser girtiyan roja 26'ê mijadarê raporek weşand. Di raporê de bal dikişîne ser şert û mercên gitiyan û îşkence û muameleyên xirab ku hikûmeta Sûriyeyê di girtîgehan de li wan dike. HRW bi raporê ji hikûmeta Sûriyeyê dixwaze ku girtî serbest bên berdan, der barê peywirdarên ku îşkence û muameleyên nebaş li girtiyan dikin bên darizandin û ji bo partiyên siyasî jî qanûnek bê derxistin.

Di girtîgehê Sûriyeyê de greva birçîbûnê ya herîm ezin îro ket roja xwe ya 31'an û hê jî didome. Lê daxwazên girtiyan nehatiye qebûlkirin û destûr nehat dayîn ku malbeç biçin zarokên xwe bibînin. Malbatên girtiyan ji be tenduristiya zarokên wan ên çalekvan bi fikar in. Naye zanîn ku dê çalekiya çalekvanê girtî yên kurd heta kengê dê bidome û der barê tenduristiya wan de jî tu agahî naye bidestxistin.

PYD'î ev dibe cara duyemîn ku dikevin çalekiya greva birçîbûnê. Greva destpêkê li girtîgeha Seydnayê ya bi îşkenceya xwe navdar dest pê kir û 17 roj dom kir.

Her wiha roja 25'ê meha mijdarê li bajarê Dirbesiyeyê komak ciwan bi boneya piştgiriyê bidin çalekiya gereva birçîbûnê ya girtiyên girtîgeha Edrayê dest bi grevê kirin. Gerev ji bo piştgiriyê hat kirin. Li taxa Zorava ya Şamê Bîzava Ciwanên Demokratîk ji bo piştgirî bidin girtiyan xwepêşandan li dar xistin Kasım günü Güney Batı Kürdistan'ın Dirbesiye kentinde bir grup genç Edra cezaevindeki tutsaklarla dayanışmak için açlık grevi yaptı. Ayrıca Şam'ın Zorava mahallesine Demokrat Gençlik Hareketi de tutsaklarla dayanışmak için bir gösteri düzenledi. ŞAM

## Talîban çav ditirsîne

*ÎSLAMABAD* - Li bakurrojavayê Pakistanê mîlîtanên Talîbanê serokeşîrekî ku dijberiya Talîbanê dikir kuşt. Rayedaran diyar kir ku teqîna ku Şahfur Xan pê hat kuştin di vegera ji nimêja cejnê de pêk hat. Xan li cihê teqînê jiyana xwe ji dest da. Serokeşîrê Bajurê yê berya Şahfur Xan jî par di teqîneke întîxarî de hatibû kuştin. Ji serê meha borî û şûn ve artêşa Pakistanê li Wezîrîstana Başûr dest bi operasyonan kiriye. Li ser vê Talîban jî li herêmê şerê xwe her diçe li vê herêmê gur dike. Di daxuyaniyên artêşê de tê gotin ku di operasyona dawî de li herêma Hayberê 30 mîlîtanên Talîbanî kuştine. Ev agahî ji aliyê çavkaniyên herêmî ve nehatine pesend kirin.

## Modela hevpar a nû

*WASHINGTON* - Sefîrê Tirkiyeyê yê Washingtonê Nabî Şensoy got ku serdana Serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan ya Amerîkayê dê ji bo 'Modela Havpar' a nav Tirkiye û Amerîkayê bibe bingeheke asasî. Şensoy vê daxuyaniya xwe di nav peyama cejna Qurbane de da. Şensoy dema ji bo tirkên li Amerîkayê dijîn peyama qurbane da, di peyamê de cihekî fire da serdana Erdogan ya Amerîkayê. Hat diyarkirin ku serdana Erdogan hefteya destpêka meha kanunê de tê serdana Amerîkayê. Erdogan roja 7'ê kanun êli Qesra Spî bi Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama re tê gel hev. Tê gotin ku bi vê serdana projeya 'Modela Hevkar' a nav Tirkiye û Amerîkayê bi vê serdanê hê bêtir teşeyek stratejîk bigire.

## Fatore li karkeran hat birîn

Şîrketa Almanyayê ya wek dêwê pola tê zanîn ThyssenKrupp hewl dide ku 20 xebatkarên xwe ji kar derxe. Di nav van xebatkarên ku dê derxe de pirtir kurd û tirk in.

Şîrketa ThyssenKrupp ku navenda xwe li Duesseldorfê ye roja 30'ê îlonê aşikra kir ku wan di nav sala malî ya 2008-2009'an de 1,87 milyar euro zarar kirine. Şîrketê destnîşan kir ku zirar pirtir ji krîza gilobal û ji nûve avakirina malî qewimiyaye. Şîrketê di sala 2007-2008'an a malîde 2,3 milyar euro kar kiribû.

Rêveberê payedar ê ThyssenKrupp Ekkehard Schulz daxuyanî da rojnamegeran. Di daxuyaniyê de diyar kir ku ew dê 5 hezar karker derxin û hin şaxên xwe yên din ku 15 hezar karkêr lê dixebitin dê bifroşin.

Hat gotin ku şîrketê resasyano cîhanê ya global li paş xwe hiştiye û tê payîn ku di sala malî ya 2009-2010'an de ji aliyê aboriyê ve hin başbûn dê pêk bên.

Di nav xebatkarên şîrketê de bi hezaran kurd û tirkên ku ji Tirkiyeyê hatine hene û di destpêkê de şîrketa ThyssenKrupp dê van xebatkaran derxe.

Her ku şîrket dikevin tengasiyê û dahatuya wan kêm dibe dest bi derxistine karkeran dikin. FRANKFURT

# Fransa û Rûsyayê dest dan hev

Rûsya û Fransayê peymanên enerjiyê û parastinê jî di nav de 15 peyman mohr kirin. Peymana herî balkêş hevkariya Fransayê ya projeya 'Xeta Başûr' a gaza xwezayî ye. Bi peymana hat mohrkirin Fransa bû şirîkê ji sedî 10'ê parên vê xetê. Ev xet wek reqîbê projeya Nabuccoyê tê qebûlkirin. Her wiha para şîrketa Renault a Fransayê dê di nav şîrketa otomotîv a rûs ya bi navê AvtoVAZ'ê de jî zêde dibe.

Peymana 'Xeta Başûr' li Parîsê piştî hevdîtina Serokwezîrê Fransayê François Fîllon û Serokwezîrê Rûsyayê Vladimir Pûtîn ji aliyê Serokê Gazpromê Aleksey Mîller û Serokê Şîrkata Fransîya bi navê Electricite de France (EDF) CEO Henrî Proglîo ve hat parafekirin.

Di hevdîtinên navber aPûtîn û Fîllon de di nav her du welatan de li ser enerjî, otomotîv, guheztin û sanaiya derman de peyan hatin morkirin.



Piştî hevdîtinan Pûtîn daxuyanî da çapameniyê. Di daxuyaniyê de diyar kir ku dê di nav AvtoVAZ'ê de para şîreketa Renaultê derkeve ser ji sedî 25'an. Hikûmeta Rûsyayê ji bo fabrîkayê 1,7 milyar dolar piştgirî veqetandiye. Dê şirînê fransî jî raste rast bi tiransfera teknolojîk 447 milyon dolar di vê şîrketê de razemeniya xwe zêde bike.

Pûtîn vegot ku hê ji bo rêjeya para şîrketa Renaul ya di AvtoVAZ'ê tê nîqaşkirin.

Serokwezîrê Rûsya û Fransayê destnîşan kirin ku sala 2010'an bibe sala çanda her du welatan. Di vê çarçoveyê de dê 150 bernameyên çandî û 38 bernayeyên aboriyê yên hevpar bên darxistin.

Serokwezîrê Rûsya û Fransayê ji bo keştiya bi navê Mîstrala barbiriya helîkopteran dike li hev nekiri. Cîgirê Yekemîn ê Serokwezîrê Rûsyayê Îgor Seçîn got ku di cihê kirina vê keştiyê de dê Rûsya bi xwe keştiya xwe çê bike. PARÎS

# Ajansa nukleerî ya NY'ê Îran şermezar kir

Saziya Enerjiya Atomê ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî (IAEA) ji ber ku Îran bi tesîsên nepenî uranyumê dewlemend dike şermezar kir.

Di meha îlonê de Îranê diyar kiribû ku tesîseke wê ya din a dewlemendkirina uranyumê heye.

Welatên Rojava li ser vê ji bo armanca Îranê ya bidestxistina çeka nukleerî gumanên wan zêde bû û ketin nav fikarna.

IAEA ji sala 2006'an û şûn ve cara yekemîn e ku der barê Îranê de biryareke wisa digire.

**Pêşniyar red kir**

Bi biryara hat girtin ji Îranê hat xwestin ku projeya dewlemendkirina uranyumê demildest rawestîne.

Serokê Saziya Enerjiya Atomê Mihemed El Baradey li ser redkirina Îranê ya pêşniyara Nevneteweyî pertekên xwe anî ziman.




Sefîrê Îranê yê IAEA'yê Elî Aşgar Sultaniye biryara IAEA'yê ya nû rexne kir. Diyar kir ku dê ve biryar diyalog û hevditinên pêk tên bixe xetereyê.

Li gor agaşta Îranê bernameya nukleerî ji bo enerjiyê pêk tîne. Li gor angaşta Amerîkayê jî Îran bi bernameya nukleerî ya mijara gotinê hewl idde ku çeka nûkleerî çê bike.

Di biryarên berê de Rûsay û Çînê pirtir destek nedidan biryarên li dijî Tehranê hatibûn girtin. Balkêşe ku ev car di biryarê de desteka Çîn û Rûsyayê jî heye.

Tehranê pêşniyara Amerîkayê ya ku dixwes Îran uranyuma xwe li welateke din dewlemend bike û ji bo enerjiyê bikar bîne red kiribû.

Bi vê planê dê hem Îranê ji bo enerjiyê sotemenî peyda bikira û hem jî welatên Rojava pê bawer bûba ku Îran çeka nukleerî çênake. BRUKSEL

## Qaza trenê: 39 mirî

*MOSKOW* - Wezîrê Rewşên Lezgîn ê Rûsyayê Sergey Şaygu diyar kir ku li Rûsyayê trêna ku sefera Moskow-Saînt Petersburgê dikir ji rê derket û 39 kes jiyana xwe ji dest dan û bi sedan kes jî birîndar bûn. Her wiha payedarên riya hesin jî diyar kir ku polîs li ser teqînek jî radiwestin. Di trênê de 660 kes hebûn. Hat gotin ku hemû rêwiyan birina Saînt Petersburgê. Birîndar jî li nexweşxaneyên nêzî bûyerê hatine razandin. Ajansa Interfax jî hêzên Rûsayê yên ewlehiyê wek çavkanî nîşan da û der barê mijarê de nûçeyek weşand. Di nûçeya li ser agahiya mijara gotinê de tê gotin ku li nêzî riya hesin çalek ku firehiya çarme dora wê mîtroyek e pêk hatiye. Ev çal jî tê angaştin ku ji ber topa hawanê pêk hatiye. Çavdêrên bûyarê diyar dikin ku berya qeza pêk bê dengeke pît bihîstine. Ji ber van daneyan tê texminkirin ku qeza ji ber êrîşek pêk hatiye.

# Di 31 salan de gav bi gav ber bi azadiyê ve...



## 'Ew garantiya jiyana xweşik û azad in'

*RÊBERÊ* Gelê Kurd Ocalan pirsgirêka azadiya jinan weke pirsgirêkeke esasî nirxandiye û ji bo azadiya jinan kedeke mezin daye. Ji bo ku jin azad bibin û jiyaneke azad û xweşik biafirînin gelek nirxandin, şîrove û diyalog pêş xistine, gelek nivîs nivîsandine. Rewşa jinan pêşketina jinan, pêdiviyên jinan her tim vegotiye. Ocalan der barê rewşa jinan de di nirxandineke xwe de wiha dibêje:

Pirsgirêka jinan girtina rojevê ji bo min ne pirsgirêkeke şexsî ye. Li dijî pêdiviyên zayandî ye jî. Di navbera zayendan de avakirina dostanî û rêhevaltiya rast qehremaniya herî mezin bû û min dît ku dûrketina ji jinan tirsonekî ye. Tirs jî ji aliyê zilamên desthilatdar ve hatibû afirandin. Di bin navê namûsê de lîstikek dihat lîstin. Dema ku digot "hez dikim" jî cara duyem ji pişt ve kêr dikir. Neqekiyeke pir giran hebû. Jin bi her awayî hatibûn dorpêçkirin, mejî, fîzîk û hestên jinan hatibûn xirakirin. Jin pir hatibûn xistin. Zilamên herî sosyalîst û jinan jî xwe ji vê rewşê rizgar nedikir.

Ez bi baweriya hesreta azadiyê bi ser vê pirsgirêke de çûm. Min gelek nirxandin, diyalog û axaftin kir. Ne mîna xwediyekî wan lê ji bo ku xwe bigihînin tiştên herî xweşik min mudaxaleyî her tiştên wan kir. Mezin bûn, heta pir mezin bûn. Lê hê jî amator bûn. Zilamên serdest û jiyana lenetkirî li ber serê wan bû. Tecrubeyên wan kêm bûn. Bi vê êşê xwe ji zinaran avêtin, bi agir şewitandin, xwe bi bombeyan teqandin. Li ser navê qehremaniyê her tişt kirin lê tenê bûn. Zilamê li hemberî wan hevaltiya mezin a wekhevan nedixwest bîne bîra xwe jî. Ew wekî kulîlkan roj bi roj diçilmisîn.

Di nava wan de xaîn jî derketin. Lê yên ku bi dil û can tevli van xebatan bûn tu caran nayên jibîrkirin. Hele şehîdên wan dê her tim weke azîzeyên vê axê û gelê me dê her tim bêne bibîranîn. Ew xwedavendên rast ên qehreman in. (...) Mirov bi jina ku malê wî ye ve mezin nabe û nabe zilam. Min nexwes ez bi vî rengî mezin bibim û bibim zilam. Heta min ev tişt weke bêrûmetî dît. Ez dizanim ku min jin anîne weke parçeyeke agir. Di nava wan de yên ku dijminatî û neheqiyê dikin jî hene. Lê ev yek jî rastiyeke û bila ew jî bizanibin divê ew qasî ku qedera aştî û şer diyar bikin xwe bikin hêz. Beyî vê yekê jiyan heram e. Bêyî vê eşq nabe. Bêyî ve hesret nayê derbaskirin. (...)

Ji bo îdiaya rêhevaltiya jinan a bi rêz û bi hezkirin ez ê heta dawiyê wekî karkerekî eşqê xebatên xwe bidomînin.

ZINARÎN NÛPELDA

Têkoşîna Azadiya Jinan di destpêka damezirandina PKK'ê de dest pê kir. Di salên 90'î de tevlibûnên jinan ên refên gerîla hem di warê hejmarê de hem jî di warê cewherê de gihîşt asteke girîng. Ji ber vê yekê jî Rêberê Gelê Kurd rêxistineke jinan a taybet anî rojevê. Di vî warî de gav hate avêtin.

Di tevlibûnên wê demê de zêde zanebûn ango hişmendiya zayendî tunebû. Bêhtir nakokiyên neteweyî û çînî derdiketin pêş. Tevlibûn bêhtir li ser vî esasî bûn. Bêguman ev rasî jî heye… Her jinên ku tevli refên gerîla dibûn lêgerîneke wan a jiyaneke alternetîf û lêgerîna azadiyê jî hebû. Lê nêrîna çepgir a wê demê hakîm bûn. Bawerî ew bû ku çareserkirina pirsgirêkên jinan jî bi azadiya giştî vê girêdayî bû.

Lê Rêbêrê Gelê Kurd ev nêrîna çepgir a wê demê qebûl nekir. Azadiya jinan, azadiya giştî ve girêneda. Berovajî vê yekê azadiya giştî, azadiya jinan ve girêda. Bi vî rengî di warî de gihîşt tespît û teoriyeke nû. Li ser vê bingehê jî rêxistineke jinan a taybet pêş xist.

Li ser vê mijarê endama PAJK'ê Têkoşîn Amed wiha dibêje: "Di warê guhertina civaka kurd de, pêşketinên tevgere azadiya jinan hem di warê civakî û hem jî di warê çandî de şoreşek derxist holê. Bi pêşketina jinan hem di nava rêxistinê de hem jî di nava gel de di hişmendiyê de guhertinên girîng derketin holê."

**Gelek zehmetî hatine kişandin**

Her wiha Amed dibêje ku gavên ku hatine avêtin pir bi zehmet pêş ketine û wisa rehet çênebûne. Amed li ser pêşketina tevgera jinan ev agahî dan: "Tiştên ku dihat kirin di nava şert û mercên şer de pêş diket. Di nava şertên ku her tişt li gorî zilaman bû de lêgerîna wekheviyê bû. Serokatiyê di serî de ji bo jinan cudakariya pozîtîf esas girt. Ji bo jinan ev yek bû bingeha pêşketina artêşê. Lê li aliyê din zilam jî ji bo desthilatdariya xwe winda neke hemû derfetên xwe dixist dewreyê. Di warê rêxistinî, psîkolojîk, siyasî de astengî derdixist. Li hemberî vê yekê jinan gelek zehmetî kişand. Lê ligel vê yekê jî Serokatiyê Têkoşîna Azadiya Jinan li ser bingeha Îdeolojiya Azadiya Jinan, teoriya qutbûnê, projeya veguhestina zilaman pêş xist. Bi vî awayî li hemberî êrîşên klasîk ên zilaman di warê îdeolojiyê de tedbîr hate girtin. Serokatiyê ev yek esas girt."

**Xebatên xwe zêde kir**

Heta 1998'an artêşa jinan YAJK, ji bo jinan rêxistineke yekîtiyê bû. Di warê girseyê de jî bingeha YAJK'ê hebû. Vê pêvajoyê bingeha têkoşînê afirand. Piştre hem di warê îdeolojîk û hem jî di warê rêxistinê dê pêwistiya rêxistineke berfireh derket holê. Ango YAJK bû bingeha vê yekê.

**Partiya jinan hate rojevê**

Rêberê Gelê Kurd di 1998'an de piştî îlankirina Îdeolojiya Azadiya Jinan, partiya jinan anî rojevê. Lê di Pêvajoya ku ev nîqaş dihatin kirin de bi Komploya Navneteweyî Rêberê Gelê Kurd hate dîlgirtin. Amed li ser vê pêvajoyê jî wiha axivî: "Ev pêvajo çawa ku di dîroka têkoşîna me û gel de pêvajoyeke pir girîng bû ji bo tevgera jinan jî pir girîng bû. Bandoreke mezin kir. Heta wê demê Serokatî bi nêz ve eleqedar dibû. Di warê fikrî, ruhî û cadakariya pozîtîf de tevgera jinan pêş diket. Lê cara ewil bi tena serê xwe ma. Desthilatdariya zilaman xwe bi awayeke aşkera da der. Ji ber vê yekê jî divê têkoşîneke piralî bihata dayîn. Ev pêwîst bû. Ji ber vê yekê jî zelalbûna armancê û tespîta stratejiya têkoşînê girîng bû."

**Gavên girîng hatin avêtin**

Ligel hemû zehmetiyan Tevgera Azadiya Jinan pêşketina xwe derdewam kir. Di qada civakî de gavên girîng hatin avêtin. Êdî tenê ne tevgereke kadroyan bû. Bi qada civakî de têkîlî zêde bûn. Di qadên azad de xebatên akademîk hatin destpêkirin. Projeya veguhestina zilaman bi gavên şenber hate pêşxistin. Partiya Jinan pêş ket. Di warê hişmendî de pêşketin û tecrube zêde bûn. Amed dibêje ku ligel hemû pêşketinan hin pirsgirêk jî derketine holê. Ozan der barê pirsgirêk û xetereyan de jî wiha axivî: "Dema ku li dijî desthilatdariyê têkoşîn tê meşandin ji bo ku şibandina wan çênebe bi taybetî divê di warê hişmendiyê de tedbîr bên girtin. Di warê hejmarê de pêşketin çiqas derkeve holê jî ji bo jinan tişta herî girîng ew e ku divê jin dûrî rastî û xwezaya xwe nekeve. Heke şibandina desthilatdaran derkeve holê ev zirarkeke mezin dide jinan. Ji ber vê yekê jî pêşketina îdiolojîk û felsefî pir girîng e. Heke guhertina ferasetê di mejî û ruhî de pêk bê ev yek dê watedar be. Dê di jiyanê de jî encamên girîng derxe holê. Her wiha di civakê de guhertinên mezin jî dê bi xwe bîne."

**Xwedî li nirxan derdikeve**

Tevgera Jinan feraseta jiyanê ya ku li Rojhilata Navîn ji aliyê jinan ve hatiye afirandin û nirxên dîrokî derketine hole xwedî derdikeve. Îdia ew e ku li ser vê axê carake din rojên azad û jiyana azad dikare bê afirandin. Ji ber vê yekê jî xwedavendiyê ji xwe re esas digire. Ev yek ji bo gelek kesan weke xeyalî tê. Lê rastî ne wisaye.Weke ku tê zanîn xwedavendî li ser vê axê sembola nirxên civakî yên ku cara ewil hatine afirandin e. Ji ber vê yekê jî bingeha vê şenber e.

Her wiha li ser vê esasê gav bi gav jiyaneke nû û azad tê afirandin. Her sal xirxên jiyana azad tê mezindikirin û zêdekirin.




Bi damezirandina PKK'ê re li Kurdistanê serdemeke nû dest pê kir. Bi taybetî jinên kurd bi damezirandina PKK'ê re heta îro di nava têkoşînê de bi pêş ketin û di civakê de guhertinên mezin afirandin



## Jinên kurd bûne xwedî îrade



*YEK JI* gerîlayên PAJK'ê Ronahî Şîlan jî dibêje ku bi derketina PKK'ê re hem ji bo jinên kurd û hem jî di civakê de guhertinên mezin pêk hatine. Şîlan dibêje ku di nava 31 salan de gelê kurd û jinên kurd bi PKK'ê re bûne xwedî îradeyekê û ev yek ji hemû cîhanê re jî îspat kirine.

Şîlan diyar kir ku aliyê herî girîng a paradîgmaya Tevgera Azadiyê esasgirtina azadiya zayendê ye. Em dizanin ku di dîrokê de di şexsiyeka jinan de hemû mirovahî hatiye kolekirin. Dema ku em pirsgirêka jinan bigirin dest divê di serî de pirsgirêka azadiya jinan em bigirin dest. Heta ku jin azad nebin civak jî azad nabe. Tevgera Azadiyê di serî de ev pirsgirêk girtiye dest û li gorî vê yekê gav avêtiye. Îro asta ki jinên kurd gîhîştiye li holê ye û ber bi çav e. Di hemû qadên têkoşînê de jinên kurd rêxistinên xwe yên xweser ava kiriye. Têkoşîna hebûna jinan bi PKK'ê re bûye têkoşîna hebûna civakê. Ji ber vê yekê jî salvegera damezirandina PKK'ê bûye destpêka têkoşîna azadiya jinan."

Ronahî Şîlan got ku ji bo azadiya jinan gavên herî mezin jî Serokatiya wen avêtiye û wiha got: "Serotakiya me di nava civakê de rewşa jinan tehlîl kiriye û ev pirsgirêk pirsgirêkeke esasî dîtiye. Li ser vê esasê jî nêzîkî vê mijarê bûye. Îdeolojiya Azadiya Jinan a ku Serokatiya me pêş xistiye li ser hin pîvanên esasî pêş ketiye. Yek ji van girêdana axê ango welatparêzî ye. Yekî din rêxistin e. Azadiya jinan girêdayî rêxistina xweser e. Dîsa ramana azad û îradeya azad e pîvake din. Her wiha pîvaneke din jî estetîk e. Ji fîzîkê heta ramanê pîvanên estekê girêdayî jiyana azad e. Li ser pîvanan PKK azadiya jinan esas digire û bi vî rengî jî azadiya civakê pêş dixe."



**Mamoste Silêman**
mamoste.suleyeman@hotmail.com

# Medyaya tirkîya û ceng

Hewteyo verên ez rewşa unîwersîteyan sero vinderta. No nuşteyê xo de, ez wazena ke, medyaya Tirkîya ser o vindera. Na seserra vîst û yewin de, tesîrê medya, heyatê şaran ser o zaf o. Her hewa ra şarî binê tesê medya de manenî. Her roj, game û seate Telewîzyonî, radyoyî, rojnameyî û internete, hedîseyan resnenî heme cayan. Rasta ey (jey) medya wexto ke rast bêro şixûlnayiş, yew nêmet a. Feqet çi heyf ke, tayê merdim û zumreyî semedê menfeetê xo, medya xo rê kenî alet. Medya; tayê çîyanî çewtan kena rast û tayê çîyanî rastan kena çewt. Eke medya semedê menfeet û realîteyê şaran weşan bikeynî, hem Tirkîya, hem zî dinya yewna merhale de bîynî. Medyaya Tirkîya (bêîstîsnayan) qet heqîqet û menfetê şaran ser o neşrîyat nêkena. Na noxta de sebiqeyin a.

Medyaya Tirkîya; ra-ray sewbîna rojevan peyda kena, çîyanî muhîman manîpule kena. Çunku kamera destê serdestan de ya, na kamera goreyê xo şixûlnenî. Na medya kultur û îdeolojî serdestan enjekte kena. Pey (bi) rojev û hedîseyanî viraşteyan, dîqetê şaran esil meseleyan ra dûrê vîyardanî.

Wextê îdareyê Eskerî ye de; ma zaf ray, bi çimanî xo dîy ke, nuştoxê rojnameyanê Tirkîya; cilî (kincî) eskerîya xoradayî û bi (pey) helîkoptera eskerîya, mintiqayanî operasyonan ra geyraynî û bi brîfînganî generalan, xeberê cengê serwîs kerdnî. Rayna ra-ray ma telewîzyonan de dîynî ke, rojnamewanan, cilî eskerîya xoradayî , hewayî leşkerî (eskerî), cephe de herb kerdo. Mesela, yew rojnamewanî va ke; “Mi Kosowa de, yew eskerê sirpê kişt.” Qrîzê Turkîya û Yunanîstanî de, yewna rojnamewanê vak e; “Mi Girawa (adaya) Qardakê ser o, bêraqa Tirkîya leqnaya.”

Dinya de, yewna rojnamewan (bê rojnamewananî Tirkîya) cepheyê herbê de, inahewa yew marîfet nênawneno. Xovero nêvanî, “Her tirk, vexto ke maya xo ra beno, esker (leşker) o.” Xora vanî; “zafê nuştoxî rojnameyan, mezge eskeran (leşkeran) çarnenî.” Tabî ewta de, tayê rojnamewanan rê qet yew vatişê ma çin o. Hetta şarê kurdan, nê rojnamewanan esla xo vîrî nêkeno. Yanî rojnamewanî ke bi objektîf, eleqederê meseleya kurdan benî, kurdî qarşîyî nê dostanî xo wefakar î.

Hem Îhtîlalê 12 Êlûle ra ver, hem zî tera pey, medyaya Tirkîya tam yew di rîyey kerda. Na medya, qarşîyê kurdan û demokratanî Tirkîya, efendîyanî xo rê bêqûsir yew xizmet kerdo. Semedo ke Tirkîya de, yew qaos vejîyo û zemînî îhtîlalê hedre bibo, rolê xo kay kerdo. Medyaya Tirkîya, 12 Êlule ra pey zî şaqşaqçîyeya Kenan Ewrnê kerdnî. Kenan Ewren û generalanî ey (jey) rê sejde bîynî û zilm û teda nê generalan rê xizmet kerdnî.

Mesela nê çenday serrî yo, medyaya Tirkîya; polîtîkaya îmha û înkarê rê xizmet kena. Yanî qarşîyê kurdan, a zî cepheyê xo de, pîze ra xebitîyaya û no herbo qilêrin rê xizmet kerdo. Propagandaya no şerê qilêrin de, bi talîmatanî generalan hedîseyî cengê neşr kerdnî. Îzehet û vilavokê generalan weşan kerdnî. Eke se hîris serrî yo, hima zî no cengo qilêrin dewam keno, ewta de, rolê na medya Tirkîya vêşî yo.

Nê hîris serrî mîyan de, hîris hizar dewî kurdan veng bîyî, hîrê mîlyonî kurdan koç kerdo. Bi hezaran merdimî kişîyayî û vînî (vîndî) bîyî, no cengo qilêrin de çewres hezar merdiman heyatê xo vînî kerdo. Medyaya Tirkîya, nê heme hedîseyan de, teraf bî. Yanî medyaya Tirkîya zî no cengo qilêrin de masûm nîya. Bi bimbayan gedeyê kurdan lete- lete bîyî. Medya Tirkîya reyna nê hedîseyî nêveynayî û bêveng menda.

Nê serranî peynîyan de, bes nêbo zî medyaya Tirkîya de yew bedilîyayiş esto. Qarşîyê şaranî tirkîya, medyaya Tirkîya gunahkar a. Rayna bellî yo ke, Tirkîya de yewerê na polîkaya înkarê ra fayde nêdîyo. Ma wazenî ke nika ra pey, medyaya Tirkîya, semedê demokrasî û aşîtî rolê xo bîyaro ca. Ez bi hîvîya aştî, Roşanê şima pîroz (imbarkên) kena.

# Senaryo ya hukumet û muhalefetî

EHMEDÊ BIRA

Şiwan û gavan berpirsîyaro ke sewalanê xo bipawê. Eg şiwan û gavan sewalanê xo mepawê, beno ke verg bikûro înan mîyan û înan talan û qetil bikerê. Ma çîyê vîra mekê, ne şiwan ne zî gavan, bi sereyê xo tenî verê talan û qetilan nêşeno ke sewalan bipawê. Eg sewalî xo ver bidê, halê qetilkaran odo zaf giran bibo. Yanê ez ney vajî, sewalî eg zîtîkan berzê vergan û mesele hal beno.

Qalî estê wina vanê, “Vergîra dost, kutukî ra post nêvejyeno.” “Meydan kutukê ra bimano bi vergan ra lotikan erzeno.” Ma şikyenê bi ney hawayî qalanî verînîyan bivînê, ema bi mi qabê mijarî ney bes ê.

Eg kutuk dewî mîyan de, bê xo, kutuk nêvîno û her roj bilawo û fekê xo berzo qijanê dewî, û şarê dewî qariş kutukî nêdê se, mesele zaf muhîm beno. Roj dê bêro kutuko har ra heme kes nasîbê xo odo bigo û heme kesî birîndar biko. Eg dewijî heme jû nêbê û dersa ey kutukî nêdê se, rojanê dewijan ê ke yeno heme sîya yê. Eg dewijî heme jû bê, halê kutukî o waxt kuno tehlîke. Ma vîra mekê ke, eg kutuk û verg ze pêsîngê bikûro tengasey heme çîyî kenê. No gam zî halê Erdoxanî zî wina yo. Çîyê ke nêko çîno. Qabê ke xo amortî bikero, bi verg û seyîtvanî ra heme gîyî odo bûro. Qabê werdişî kewto livan mîyan. Heta qabê berjewendîyanê şîrketanê xo dewlet dewlet geyreno. Dewijî pêy hesyayê ke, kutuk, verg û seyitvan bîyê yew û wazenê warê Mezapotamyayî dewa înan ra berzê. Qabê ke berzê, sernaryo ya zaf gird amade kerdê. No senaryo wina eyseno. Raya sifteyin DTP odo bêro lekekerdiş. Qabê ke DTP bêro girewtiş amûranê mahkemeyî ê dê arê bidê. Şeş aşmanê sifteyinî ê serra verê ma de, îhtîmalê dê gird DTP bêro girotiş. Partîya ke hurînîya ay de ca bigo zî eg bişikyo kongreyanê xo temam bikero se, odo bikûro veçînayişan. Qabê ke şarê dewî mekûrê veçînayişî û qabê ke dewijî bi aborî qels bibê, heme rayîyaranê ê DTP’î estê wazenê bixetimnê. Hetanê ney demî zî ê dê qala demokratîk açilima vip û veng bikerê. Û DTP’î bigrê. Pekî eg senaryo vîzyonî de ca bigo se beno?

> Hukumet bi muhalîfanê xora yew bîyo. No çî qabê mesela kurdan hal nêbo yo. Medya ya tirkan wa ze verî qilêrin kaya nêdo xo. Wa şarî tercîhê xo bixo bikê

Çîyê nêbeno. Şarê dewî zatî verêra yo ke veyşan ê. Dewijanê ke kabê aborîya xo şîyê dewanê verg, kutuk û seyîtvanî zî zatî raştî erîşa înan yeno. Çîyê ke eyseno rayîr odo zaf kilm bibo. Şîmadê vajê senî? Nedarê cayê de bandor bido se, de bertekî / etkî zaf wişk bivejyê. No zî odo bibo semedê alozîyanê zaf girdan. Odo bibo semedê gunî rijyayişî. Odo bibo semedê sînor kerdişê dewan. Odo senaryoya DYA (Amerîkayî) zî bêro ca. Zatî Erdoxan temsîleteya Asyayî a DYA’î giroto xo milan. Û gora berzewendîyanê DYA’î xebatanê xo keno.

Dewr dewra aştî û birateyî yo. Ne verg ne kutuk, nezî şiwan, gavan û sewalî bê heş nîyê. Heme warê heş û ramanî yê. Wa hemeyî vîr mekê ke, serketişê şer î çîno. Heme kiştî vinî kenê. Çîyê ke beno bi şarî beno.

Ney ra, qabê şarî rewşî bizanê ferz o ke heme medya û sazî û dezgeyî xo çiman ra çîyan bidê ravêrayiş. Eg medê ravêrayiş, ê zî benê semedê gunî rijyayişî û benî warê qetilî. Ey ra pey wa kes nêvajo ke mi nêzanay ke wuna bîyênê.

Gurey mi bi nuştişî qalan bikerî ke, mi milra bivejyo, verî vînayiş û mojnayişê şaran o. Çîyê ke ez bikerî no gam no senaryo eyseno. Boka Homa biko çîyê dê wina nêbo. Heme der û dor wa bi biratî û aştî de bo.

Ez wazeni ke Roşana roşnî, wa roşnîya biratey û aştî bîyaro Anatolîya û Mezapotamyayî sero. Bi ney dil weşey ez roşana heme wendoxan û keyeyê înan pîroz keni. Bimanê di weşey di.

# 27’ê Teşrînî serrageyrayişê PKK’î yo

ZAZA CEBELÎ

***“Çare dîyayîş (hênge) gamê nîyo, tarîx o. Kes nîyo komelkî yo”***
***Abdullah Ocalan***

PKK çaxdaş yew mîlad o. PKK rihê, keda şehîdan o.


PKK senîhewa sazbi? Çi keda reyde virazîya? Ney ra, dîroka PKK’î zaf muhîm o.

Biyayîşê PKK’î tepkîya yew gûrûba amator bi. 1975’ê nîsanî de, Enqera de pingara/baraja Çûbûklî de yew gûrûbê kurdîstanî kom bî. Tarza organîzkerdişê ey yew teybetî bi. 1974, 75, 76’an de, di bindê gurûba ADYOD’î de xebata xo avera berdê.

Serekê şarê kurdan, tarîxî yew biryar geno. 1977 de, Enqera ra ageyreno Kurdîstanî. Herema Kurdîstanî de, cîya cîya kombîyayişan virazeno. Apeyê kombîyaşan ageyreno Enqera. Hîrê rojî ra pey Hakî Karaer şehît kuno. Gurûba şoreşa Kurdîstanî ra, yew astare qelibyeno. Tabî her kes şaş û mat maneno. Gurûba newe mîyan de, îxanetey û komplo dest pey keno. Embazî qabê şahedeta Hekî kom benê. No kombîyayiş de wanê, ma senîhewa heyfê embazê Heqî bigrê. Ewta de yew biryaro tarîxî yeno girotiş. No biryar, şahadeta embazê Hekî ra cewab bi, û biryara PKKbiyiş î genê. Programa taslaxa partî virazîyeno. 1978’ê 27 Teşrînê de qeza Amedî Licê dewa Fîsî de 22 kesî amator, sozê biryara partîbîyişî genê. Hînê rêxistinê xebati bajaran de tengasey beno. Şansê cuyê kesan nêmendo. Ewta de sernawera yew biryar genê. Biryara şîyişê koyan sero. Bi ney ê dê Rojhelatamîyanin de bişikyê bivinderê.Girotişê biryarî, heway Îbrahîm Pêxemberî hîcret kerdişê welatê Kenanî beno.

Serekê Şarê Kurdan, verê cûntaya 12’ê êlulî hîs keno. Rayna zî biryar genê, bi ney biryar zî kadroyanê PKK yew bi yew apeya oncenê. Rojhelatamîyan de bîrdozeya îdolojîk û polîtîk perwerde benê. Bihadreyeya perwedî ra dim, qabê şerê girdî, qabê şerê şarî xebatan dê bikê. No şer zî sankî înan rê yew kanûn bo vînay û day xo ver. 1980 de bi çend gurûban şinê Rojheletamîyanin û ûca de perwerdeyeya xo qedînenê û

**PKK keda rêhê şehîdanê PKK yo û hareketa nixdayişî yo. No hîrês serrî yo qabê azadî pêrodayiş keno. komplo û tasfîyeyî berteraf kerdo**




apeya ageyrenê welatê Kurdîstanî. Û xebatanê înan dest peykenê.

Hareketa Azadî gere vengê xo bivetay. Sermîyanê înan tarîx bi. Zîndana de Amedî de, vahşeta, qirkerdiş des pêykerdibi. Qabê ke kurdan biqedînê sifte PKK’î hedef girotî.

Pêşengeyanê PKK’î zî, mîsyoneya xo a tarîxî ardî ca. Vere Mazlûm Dogan, îxanetey û rihê bindestey vero xo dano vindarnayiş. Bi şahadeta xo bi hîrê çopê kibrîtî meşaj dano, Embazanê xo û şarê kurd. Tira dim zî, Ferhat Kurtay, Kemal, Mazlûm, Hayrî, şahadet kunê. Hînê no adirê zîndanî ra, 15’ê tebaxî beno despêk.

Şerê gerîlayan hînê fermî beno, 1986 de Mahsûn Korkmaz şehît kuno. Şerê gerîlayan mîyan de, ca bi ca taqtîkî de şaşey benî. In şaşey ra, hewna hareket xo apey anceno. 1986’î de, PKK di qirîza kongreyî virazîyena. Kongireyî mîyan de îxanet û tasfîye xo nawneno. 1987 de, no şaşey ra dimî zî, xo sernawera kombiyayîş kenê. 90, 91, 92, serrnawera konferansî wirazîyenê û tasfîye berteraf beno.

Şerê Azadî roj bi roj gird beno berz beno. Şarê kurd zafî kesî beşdarê gerîlayan benê.

1993 cepheya dewleti de, qabê şarê kurdan çî yo muhîm beno. Ozal çareserê dawa kurdan ra erenî ewnîyeno. Demîrel zî wano, ma nasnameyê kurdan sinasnenê. PKK zî adir birnena. Ozal nêşka bikero û mireno. Adirbirnayiş betal beno.

1998 de komploya mîyanênetewî des pêykeno. 15’ê tebaxa 1984 ra heyanî 15’ê sibata 1999’î de şeranê girdî virazîyenê. Serra 2000 de PKK mîyan de, yew tengasey virazyena. Ney ra pey bi ney haway nêravêreno. Zaf çîyan de problem vejyeno. Çareserî nêbena. Hînê gere neyê mîrasê serran sero yew nameyê newe sero PKK dewam bikerdaynê. Serekê Şarê Kurdan demanê tarîxî sero lêkolînî virazeno û bi nameyê dê newe KADEK û dimara zî, KONGRA GEL amede kerdî. Ewta de Dewlet odakli partî , demoqratikbiyiş û azadî esas ame girotiş.

Tikey nakokî vezyay. Ney ra zî, PKK nirxdayişe xo da. No polîtîka kawrama îradeyî ra bi ahlakê û wina dewam kerd. PKK no bedilnayişê zîhînetî ra, dîrokî de bi nûmûneyê. Bawerîya berzîyayîşî qadroyan mîyan de ca girot û berz bî.

Ma verê va, PKK keda rêhê şehîdanê PKK yo û hareketa nixdayişî yo. No hîrês serrî yo qabê azadî pêrodayiş keno. Her vextî de îxaneta, komplo û tasfîyeyî berteraf kerdo. Ewro zî, qomplo û tasfîye dewam keno. Her çiqas, ewro Dewleta Tirkan qabê şarê kurdan ra ezberê xo bişikno se zî, tasfîye, îmha û înkara ay dewam keno. Hewna zî, qabê pêameyişî samîmî nîya. Plan pirojeyê rayberdoxanê Tikîyayî çîno. Mûhatap çîno. Her wextan de, şarê kurdan muhatabê xo nîşan dayo û eşkera kerdo. Ma vanê ke , hînê şerê şarê kurdan, ameyo fînal, no fînal zî serrageyrayişê sazkerdişa PKK’î yo. Serra newe ya tarîxî, mîsyoneya xo kaykeno. Serkewteya şarê kurdan virazina.

**Fîlmê 'Li Dêrsimê Efsaneya Munzur Baba'**

Li Dêrsimê efsenaya 'Munzur Baba' ji aliyê her kesî ve tê zanîn. Galaya fîlmê derhêner Mehmet Ozcan ya bi navê 'Li Dêrsimê Efsaneya Munzur Baba' pêk hat.

Turabî Saltik ku di fîlmî de çîroka efsaneyê vedibêje axaftinek kir û anî ziman ku Dêrsim xwedî dîrokeke kûr e û wiha got: "Gelek kewneşopiyên Dêrsimê hene. Efsane û çîrokên evînê gelek in. Efsaneya Munzur Baba jî yuk ji van e." Piştî Axaftina Saltik fîlm hat nîşandan û fîlm rastî eleqeyeke germ hat. Derhêner Ozcan axaftinek kir û diyar kir ku li ser fîlmî salekê xebitiye. Ozcan bilêv kir ku bi kişandina vî fîlmî mebesta wan ew e ku efsaneyên gel ragihînin pêşerojê. **STENBOL**

# Vegera Dibistana Frankfurtê

## Di muzeya cihûyan de der barê Dibistana Frankfurtê de ku dibistaneke girîng e pêşangeh hat vekirin. Di pêşangeha ku bi navê 'Dibistana Frankfurtê û Frankfurt- Vegera Almanyayê' hat vekirin de bi taybet jî salên sirgûniya endamên dibistanê tê vegotin

Meral ÇÎÇEK - FRANKFURT

Dibistana Frankfurtê di nav xebatên Enstîtuya Lêkolînên Civakî de derket û ev demek e ku herî zêde ev dibistan fikra dîrokî ya rojava tevlihev dike. Di demeke ku faşîzm û kapîtalîzmê nirxên mirovahiyê binpê kiribûn de komek rewşenbîr ji bo geşkirina hêviyên pêşerojê xwestin alternatîfekê ava bikin. Di sala 1923'an de li Almanyayê komek hîndekarên Zanîngeha Goetheyê yên wekî Theodor W. Adorno, Max Horkheimer, Walter Benjamîn, Herbert Marcus û Erich Fromm di nav xebatên Enstîtuya Lêkolînên Civakî de cih girtin.

**Berê wijdan tê bêdengkirin**

Di nav xebatên Dibistana Frankfurtê de xebateke sereke pêşvebirina 'teoriya rexneyê' bû. Hêmaya 'rexneyê' zor dida sînorên pozîtîvîzm, materyalîzma diyalektîk û zanistiya dîmenê. Her wiha endamên dibistanê dixwazin nêrîneke nû ya li ser lêkolînên civakî bi pêş bixin û li ser vê dixebitin. Ji bo vê jî bi taybetî hêmayên wekî ez, malbat, otorîte, estekîk û weşanên girseyî ku ji aliyê marksîzma klasîk ve wekî hemayên jor tên binavkirin tên lêkolînkirin. Ekol aliyên hêmaya îdeolojîk a piştgiriyê dide serdestiyê rexne dike û îdeolojiyê wekî bingeha zanistiya civakî bi nav dike. Ger rewşenbîr wijdana civakê bin, ji bo hilweşandina nirxên civakî divê rewşenbîr ji holê bên rakirin. Li Almanyayê dema faşîstan îktîdar bi dest xist yekem karê wan ew bû ku dengê wijdana civakê bêdeng bikin. Ji ber vê yekê di sala 1933'an de Enstîtuya Lêkolînên Civakî bi boneya 'xebatên komînîzmê' hat girtin û dest dan ser dibistanê. Peywira rewşenbîr û hîndekarên ku di Zanîngeha Frankfurtê de dixebitîn hat bidawîkirin. Rewşenbîr bi sirgûniyê re rû bi rû man. Rewşenbîn ne tenê ji ber komunîstiyê dihatin tawambarkirin, her wiha sûcekî wan ê din jî ew bû ku cihû bûn.

**Zehmetiya ku nekuje...**

Gotinek heye dibêjin 'Zehmetiya ku nekuje hêzê dide min'. Ev gotin ji bo endamên Dibistana Frankfurtê gotineke pir rast e. Walter Benjamîn li hemberî gefên faşîzmê di xwe de zêde hêza berxwedanê nedît û xwe kuşt. Lê bi taybetî Adorno û Horkheimer di warê fikr û ramanê de li sirgûniyê xwe pir bi pêş xistin. Lê ev nayê wê wateyê ku di sirgûniyê de bextewarbûn. Li dijî vê êş û zehmetiyên ku di sirgûniyê de kişandin ji bo wan bû sedema bersiva pirsên ku digeriyan didîtin. Di nav xebatên wan de yên herî girîng berhema 'Diyalektîka Ronahîbûnê' û Minima Moralia' dihat. Ev berhem li Amerîkayê hatin nivîsandin di van her du berheman de jî îflasa mîrateya rojava tê vegotin.

**Heta 10'ê çileyê vekiriye**

Rewşenbîrên ku çûn sirgûniyê piştî şerê Cîhanê yê duyemîn dîsa vegeriyan Almanyayê. Sedemeke vê biryarê jî ew bû ku di nav pêvajoya avakirina demokrasiyê de cih bigirin. Piştî şerê cîhanê li Almanyayê fikra nîhîlîzmê hakim bû û kuşaka 68'an li hember vê têdikoşiya lê dîsa jî bingeha vê tevgerê di warê fikrî de Dibistan Frankurtê bû. Her çiqas di ser de dehan sal derbas bûbûn jî fikr û nirxandinên Dibistana Frankfurtê îro hê jî rastiyên xwe diparêzin.

Ji ber vê yekê pêşangeha ku li bajarê Frankfurtê li Muzeyan Cihûyan de hat vekirin hêjayî dîtinê ye. Di pêşangehê de belgeyên orjînal, eşyayên taybet, çavkaniyên nivîskî û dîmen, sirgûniya rewşenbîran ya ku piştî di sala 1933'an de faşîzm hat ser kar û vegera wan mijarên pêşangehê ne. Hestên taybet ku rewşenbîran bi nameyan ve hev re par vekirine jî di pêşangehê de cih digire. Nêrînên derbarê cihûtiyê tên vegotin. Pêşangeh dê di Muzeya Cihûyan de heta 10'ê çileya 2010'an ji bo kesên dibistanê nêz ve dişopînin vekirî bimîne.




## 'Baxçeyên Porteqalan' xelat wergirt

Projeya fîlmê kurdî ya ji aliyê derhêner Ozkan Kuçuk ve hatiye amadekirin bi navê Baxçeyên Porteqalan (Portakal Bahçeleri) di Mîhrîcana Fîlman a Navneteweyî ya Selanîkê de di atolyeya Fona Balkanan de fîlmê projeya wê herî baş hate hilbijartin. Atolyaya Fona Balkanan îsal sê fîlma layikî xelatê dît û yek jê projeya fîmê Baxçeyên Porteqalan e. Xelata atolyeyê ya îsal projeyên sê fîlma bi hev parvekir. Prûdiksiyona Sînamayên Mezopotamyayê bi projeya xwe ya Baxçeyên Porteqalan, Ji Romanyayê Bihara Romen û ji Sirbistanê jî Diya Asfaltê xelata projeya herî baş parvekirin.

Di 14-16 mijdarê de atolyeya Fona Balkanan 7'emîn projeyên pêşketî hildibijart. Di hilbijartinên îsal de ji 8 welatan 9 proje hate hilbijartin.

Di atolyaya sê roj berdewam kir de niqaş û hevdîtinên bi pisporên sektoran re hate kirin û di 16'ê mijdarê de encambû.

Prûduksiyona Sînamayên Mezopotamyayê bi projeya xwe ya Baxçeyên Porteqalan, Ji Romanyayê Bihara Romen û ji Sirbistanê jî Diya Asfaltê xelata projeya herî baş parvekirin.

Gava juriyê atolyeya Fona Balkanan xelat dan derhêner Ozkan Kuçuk taybetiya çîrokê vegot û li ser sekînî.

Kucuk diyar kir ku dê ji bo biryara juriyê fîlimek heja amade bike û got beriya niha projeya Baxçeyên Porteqalan tevlî atolyeya Li Ser Pirê Hevdîtin jî bûye. **STENBOL**


PÎROZBAHÎ

*Cejna we pîroz be…*
Em bi daxwaz û hêviyên germ cejna hemû gelên Rojhilata Navîn ji dil pîroz dikin

**Şaredarê Cizîrê Aydin Bûdak û Endamên Meclîsa Şaredariyê**

PÎROZBAHÎ

Em bi hêvî ne ku ev cejna pîroz bibe wesîleya aştî û biratiya gelan û bi xwe re aştî û aramiyê bîne. Ji bo hemû gelên ku li vî welatî dijîn
*Cejna Qurbanê Pîroz be!*

**Şaredarê Colemêrgê Fadil Bedirxanoglû û Endamên Meclisa Şaredariyê**

PÎROZBAHÎ

Bi hêviya di pêşerojeke azad de li hemû deverên welat ala kurdî û kurdayetiyê li ba bibe, cejna hemû endam û bikarhênerên malperên me *www.wergerine.com* û *www.pckurd.net* pîroz be!

PCKURD.NET Malpera koma pckurd
wergerine.com navenda wergerên kurdî

PÎROZBAHÎ

Bi baweriya hevaltiyê
Bi germahiya hestên biratiyê
Bi hêviya rojên xweş û azad
Ez cejna Qurbanê li hemû gelê xwe pîroz dikim

**Kenan Bayer - Amed**

PÎROZBAHÎ

Bi hêviya ku bibe sebeba biratî û wekheviyê
*Cejna Qurbanê li we pîroz be*

**Mehmet Yener**
**Berfin Komîsyon**
**Eraseya Sebzeyan - Amed**















Rizoyê Xerzî
rizoxerzi@gmail.com

# Gelo Levent Kirca xurufiye an jî qîlên xwe beş kiriye?

Piştî ku li Tirkiyeyê goftûgoyên li ser pirsgirêka kurd hatin destpêkirin her tişt li nava hev ket û çepgir bûn rastgir, demokrat bûn faşîst an jî bi gotineke din her yekî rûyê xwe yê aşkera da nîşandan. An jî ew qîlên xwe yên dêlegurî derxistin derve. Çîroka Onur Oymen û pêşniyara komkujiyê ji bo kurdan we tevan bihîst û bi sedan mînakên wiha jî ku niyeta tirkan a ji bo bêçaretiyê derketin holê. Ev tev dihatin texmînkirin lê hin kesên ku bi salane bi navê demokrasî û biratiya gelan xwe nîşan didin, wan jî xwe li ber van gavên qaşo çareseriyê negirtin û jehra hundirê xwe vereşiyan.

Yek ji wan kesan jî hunermendê bi nav û deng ê qaşo çepgir û demokrat Levent Kirca ye. Levent Kirca ku dawiya emrê xwe xurifiye û nema zane ku çawa qeşmeriyan bike û xelkê bikenîne dest avêtiye rexnekirina van gavên qaşo çareseriyê û diranê xwe tûj kirine.

Berî çend rojan min bernameya wî ya “Olacak O kadar” temaşe dikir ku berê ev bername bi rengekî qerfî rexneyên tûj li çewtiyên pergalê dikir lê niha bûye dahola şerê li dijî kurdan. Levent Kirca di vê bernameya xwe de hemû qeşmeriyên xwe û kêmasî û eyb û arê hişmendiya tirkan tevî dixe stûyê kurdan. Çi tiştekî nexweş, paşverû, cahiltî û zinêkarî hebe, xwe dixe qilifê kurdan û wan genîtiyan dixe stûyê wan.

Tiştê ku herî zora min çû di bernameya wî de ya ku ew ê cara dawî be ji bo min ku lê temaşe bikim de, 2 skêtşên ecêb bûn. Yek jê behsa wê şeva Hunermend Ahmed Kaya dikir ku li şûna wan êrîşan rexne bike, piştgiriya wan êrîşan dikir û Ahmed Kaya rexne dikir. Skêtşa xwe ya din jî li ser wê koma aştiyê ya ku li ser banga Serokê KCK’ê Abdullah Ocalan hatibû Tirkiyeyê çêkiribû.

Bi rastî jî ez bi xwe gelekî sosretmayî mam ku mirovekî wekî Levent Kirca ew qasî bi erzanî û bêberpirsyarî nêzî pirsgirêkeke herî giring a vî welatî bibe. Ev jî baş dide xuyakirin ku dema mesele tê ser kurdan û mijar dibe pirsgirêka kurd wê demê rastgir û çepgir, demokrat û faşîst namîne tev bi hevre dibin gur û dikevin paxila kurdan de.

Îca ez bi serê bavê te kim Levent Kirca te di dema dawî de nasnameya xwe ya rast û rohnî derxiste holê û hate bêgumankirin ku tu cudahî di navbera te û faşîsteki ku kurdek li bajarekî tirkan linc kir ji ber ku bi kurdî bi telefonê axifî, an jî faşîstên ku li Mêrsinê xwe li meşa DTP negirt û êrîşî konvoya wan kir, li vir jî dîsa medya we ya “bê alî” bi serkêşiya serokwezîrê vî welatî bûyer berovajî kirin û gotin ji ber ala kesk û sor û zer ev bûyer qewimî ne.



Evdile Koçer
evdilekocer@yahoo.com

# Şeqreq û teqreqe me kurdan!

Ez jî nizanim bê ev çi şeqreq û teqreqa me ye heyran!
Madem ku em ê derewên herî modern jî wekî pîvanekî welatparêziyê deynin ser riya civakê…

Madem ku wê serokbelediyeyên me yên ezîz û delal wekî Sûleyman Demîrel xwe bihejînin û bi tirkî silavê bidine me…

Madem ku em ê hemû xirabî û şaşitiyên xwe bi rengê kesk û sor û zer ve bipêçin û bi gilî û gazincan ve bixine stûyê dewleta ergenekonê…

Madem ku henekên tirkî yên parlamenterên me wê ji meclîsa tirkan belavî hemû derê dinyayê bibe…

Madem ku em ê di nav xwe de jî “CHP”yekê ava bikin û siyaseteke statûkoparêz li ser hemû civakê ferz bikin…

Madem ku em ê li ser kêlên şehîdan bi tirkî helbestan bixwînin û xwe wekî qehremanên veşartî pêşkêş bikin…

Madem ku em ê di sazî û dezgehên xwe de felsefeya “bila biçûk be, bila ya min tenê be!” ava bikin…

Madem ku em ê pêlava piştkurmî û dimaldemayiyên wêjeya tirk bi heyecaneke mezin ve wergerînin ser rih û dîwana nifşên nû û vê yekê wekî şoreşa wêjeyê bi nav bikin…

Madem ku em ê malbat û zarokên şehîdan muhtacî “Mehmetçîk Vakfi” bikin…

Madem ku emê wekî ronesanseke nedîtî pêşbirkên wêjeyî bi tirkî jî li dar bixin…

Madem ku em ê çîrok û romanên xwe weke forseke mezin bi tirkî bixwînin…

Madem ku wê biraziyên me wekî aktorên tirkan ji me re bibêjin “Amca, abla!!!”…

Madem ku em ê li her derî weke tişteke gelek popûler bikevin pêşbaziya xwehelandinê…

Madem ku em ê hemû nezanî û ehmeqiya xwe bixin stûyê rebena zimanê kurdî…

Madem ku em ê hemû vandalî û barbariya xwe bavêjin ser pişta çanda kurdî…


Madem ku em ê axatiya rihê xwe di nav vê civaka xwelîser de weke siyaseteka nû pêşkêşî hev bikin…

Madem ku em ê hemû çêr, geflêxwarin, namerdî, neqencî, serserîtî, sûtalî û binkeftinên xwe wekî parastina “Kurd û Kurdistanê” nîşanî hevûdu bikin…

Madem ku em ê nikaribin li ‘doz û evîn’a xwe jî xwedî derkevin…

Ê nexwe ev çi şeqreq û teqreqa me ye heyran!!!

# XAÇEPIRS



**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Rengek... Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e **2.** Wext, zeman... Cure, celeb **3.** Baneşana kêfxweşiyê... Seyran **4.** Kesê/a ku zimanê wî/wê giran e **5.** Bireke pez ku ji 100 hebî heta 200’î **6.** Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin... Di Bektaşîtî û Mewlewîtiyê de birakê terîqetê **7.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Dinya, cîhan **8.** Rengek **9.** Tîpên navîn ên "raye"yê... Paytexta Perûyê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Notayek... Aleta ku demê nîşan dide **2.** Birayê diya mirov... Rêxistina polîsan a naziyan **3.** Cejn, eyd... Rehîbê Budayan **4.** Ji dev derneketî... Baneşaneke gazîkirinê **5.** Xwîşka bavê mirov... Dijbera germ **6.** Beranê 1-2 salî **7.** Şaşwaz, metel... Nepêşekar, kesê ku di kar û barê xwe de bi pêş neketiye **8.** Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye **9.** Pêvedana bi hesinekî sincirî... Rojek... Peyva neyînî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | O | ■ | E | T | Ê | ■ | D | O |
| 2 | E | N | A | M | ■ | Z | I | R | X |
| 3 | ■ | S | S | ■ | B | I | R | A | ■ |
| 4 | A | ■ | A | M | A | N | ■ | M | Û |
| 5 | S | I | N | E | ■ | G | A | ■ | R |
| 6 | A | R | ■ | H | O | ■ | D | E | ■ |
| 7 | ■ | A | L | Î | ■ | K | A | W | A |
| 8 | A | ■ | Î | N | S | A | N | ■ | R |
| 9 | D | A | S | ■ | Î | N | ■ | T | Î |

# Xalê Rîxo…

Rojekê du heb mirov dibine hevalên hevdû her du qederekî bi rê de dimeşe piştî demekê. Rêwiyê ciwan ji hevalê xwe re dibêje xalo tu bi qedrê xwedê ke navê te çi ye. Ew dibêje heyran ji min re dibêjin xalê Şêxo. Navê min xalê Şêxo ye. Mirovê ciwan îjarê jê re dibêje xalê rêxo de başe ez nika navê te fêrbûm tu bi qedrê xwedê ke îjarê navê bavê te çi ye ez dixwazim navê bavê te jî fêr bibim. Îjarê xalê Şêxo jê re dibêje. Xwarzê te çi fêrbûna navê min ediland îjarê dora fêrbûna navê bavê min e. Dev ji fêrbûna navê min berde…

# Ga û golik…

Rojekê camêrek li mala mirovekî fenek û çûkas dibe mêvan xwediyê malê êvarê şîvê tîne datîne ber mêvanê xwe û jê re dibêje mêvanê delal de kerem bike were em tev de şîva xwe bixwin.

Li ser ev xwestek û teklîfa xwediyê malê mirovê mêvan tê ser sifreyê û ew û xwediyê malê tev de dest bi xwarina şîvê dikin. Herdû çend kevçî xwarin dixwin. Hîn destpêka xwarinê bûye.

Xwediyê malê dixwaze lîstokekê lê serê mêvanê xwe çêbike û wî di fediyê de bihêle û nehêle ew şîvê bixwe. Hema ew destê xwe davêje zikê xwe û dibêje of of welehîn ez bi xwarina şîvê bûme weke gayekî min kêm kir xwedê zêde bike û ji ser sofreyê bi paşde vekişiya.

Mirovê mêvan li ser ev helwest û gotin mazûbanê xwe qet rewşa xwe xera nekir û wî jî ji wî re got heyran tu dibe ku bibe weke gayekî lê ez hîn nebûme weke golikekî jî û xwarina xwe berdewam kir… *Naîl Demîr*

www.arsivakurdi.org


ROJEV
29 Mijdar 2009 Hejmar: 17 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

# Gurçik çawa dixebitin?

Gurçik di laşê mirov de yek ji lebatên herî girîng in. Gurçik di her du kêlekên movikê de ne. Di mazmazka mirov de cih digire. Gurçika rastê bi qasî 1-2 cm li jêra gurçika çepê ye. Ev lebata biçûk ya mirov fonksiyona wî ya di laşê mirov de gelek mezin e. Ne jê be mirov tune ye.

Cihê ku gurçik pêve ye pir zexm e. Livandina xwe bi bêhn dan û standinê digire. Di her du gurçikan de nêzî 2.400.000 "nefron" hene. Hejmara van bi pêşveçûna temenê mirov kêm dibe û di demê de dibe nexweşî.

Dil, di deqeyekê de 5-6 lître xwînê pompe dike, 1.5 lître ji aliyê gurçikan ve tê fîltrekirin. Ji nefronên ku di her du gurçikan de ne, di deqeyekê de lîtreyek xwîn derbas dibe. Ev jî nîşan didin ku gurçik di laşê mirov de pir girîng e. Xwîna ji gurçikan fîltre bû pê de, ji bo sûda xwe dîsa dikeve nav xwînê ku madeyên bijehr ên ji laşê mirov bên avêtin dikeve nav xebatan. Gurçik erka xwe anî cih pê de, tiştên ku ji laş re nabin bi gurçikan diçin mîzokê. Û ji wir jî davêje derve.



Dema fonksiyona gurçikan xera dibe, nikare vê peywira xwe bi cih bîne. Di xwînê de made divê werin avêtin, lê wexta ku neyne avêtin û di xwînê de bicivin û dibe sedema rewşa nebaş. Dawiyê gurçik heta îflasê jî diçe. Di bijîşkiyê de ji vî rewşê re "uremî" tê gotin.

Piraniya nexweşiyên gurçikan ji ber vê sedemê ne. Dema mirov bi vê nexweşiyê dikevin pir bêzar dimînin û bêtaqet dibin. Bi xerabûna fonksiyona gurçikan apalîna xwînê pêk nayê û ev jî di xwînê de dibe sedema dayîna semptoman. Mirov di nexweşiya şêrînmîz û ya tansiyonê de divê gelek baldar bin. Lewre ev her du nexweşî jî dema neyên dermankirin dibin sedema nexweşiya gurçikê. Wek tê zanîn, ev her du nexweşî jî di nav civakê de pir e. **AMED**

# Zingîniya guhan

Car caran xuşînî û zingînî ji guhên mirov tê. Xurtbûna vî dengî kesên ev lê ye nerehet dike. Bi gelemperî ji zingîniya guhan re "tînnîtus" tê gotin. Zingîniya guh bi serê xwe ne nexweşiyek e.


Nêzîkî % 30'yê mirovan bi zingîniya guh gazindar in. Ev deng piraniya caran ji ber xewê winda dibe, lê pêde dibe ku cardin ji guhan ev deng tê. Zingîniya subjektîf li derûdorê nayê bihîstin. Lê ja objektîf ji livandina masûlke û yên guhê navîn tê, gelek caran ji alî mirovekî nêzîk de tê bihîstin.

Destpêk û windabûna zingîniya guh ne kifş e. Carna ew deng heta mirinê berdewam dike û carna jî ji ber xwe ve winda dibe û diçe. Eger ev nexweşî zêde bidome dibe sedema mirina sinirên guhan û heta mirinê ji wî mirovî naçe.

Hinek sedemên zingînî yan çingîniya guh ev in:

✓ Xwîn baş nagere û ev bandorê li guhê tenik dike û dibe sedema kilsgirtinê.
✓ Teqîneke bi dengê bilind.
✓ Hem tansiyona bilind û hem jî ya nizm dibe sedema zingîniya guhan.
✓ Hestiyên guhan di hundirê xwe de kils digire.
✓ Nexweşiya şekir.
✓ Gava damarên xwînê teng yan fireh dibin.
✓ Nexweşiyên damarên ser û stûyê mirov ku nahêlin xwîn baş bigere.
✓ Depresyon û stres jî gelek caran dibin sedema zingîniya guhan.
✓ Qîrewîr, trafîk, dengê makîneyên kar jî gelek caran dibin sedema çingîniya guh. Ev deng carna di xewa şevê de jî berdewam dikin.

Heger zingîniya guh ji nişkê ve derkeve holê, zêdeyî du rojan bajo û bibe sedema sergêjiyê û serêşiyê, divê mirov zû xwe bigihîne doktorek û li xwe bipirse. Nexwe ev zingînî dê bibe sedema kerbûnê. **AMED**





# Pîrozbahiya dilşikestî

Pîrozkirina cejna kurdan 48 saet e. Lê kurd ji vê têr nabînin. Dixwazin sînor bê rakirin. Ji bo vê jî dixwazin ku rayedar bi baldarî li ser vê rawestin

Bi salan bû ku, dewleta Tirkiyeyê destûr nedida merivên hev ên kurd. Ku hinek li Sûriyê hinek jî li Tirkiyeyê ji hev dûr dijiyan û pîrozbahiyên xwe li ba hev nedirin. Sînor ji wan re bûbû astengî. Li paş têlên bidirî, li hev dinêrîn û kelogirî dibûn. Lê ew hemû kurd bûn. Sînor di nav wan de bû asteng û ji hev qetandibûn. Ev rewş heta cejna Remazena 2009'an dewam kir. Û bi destûra dewletê rewş guherî. Di vê Cejna Qurbanê de gelê kurd ê Sûriyê û Tirkiyê ji bo ku şahiya cejnê pîroz bikin destûra 48 saetan wergirt.

Li navçeya Serêkaniyê pîrozbahiya serxetê û binxetê dest pê kir. Welatiyên li Resileyn û Hesekî dimînin bi boneya cejna xizmên xwe yên li Tirkiyeyê pîroz bikin ji bo 48 saetan di deriyê Serêkaniyê re derbasî Tirkiyeyê bûn. Lê gelê kurd xwestin ku sînor bên rakirin û wek Ewropayê bi rehetî herin û werin, çimkî em jî mirov in.

Bi sedan welatiyên Resileyn û Hasekiyê yên Sûriyeyê bi munasebeta Cejna Qurbanê ji bo cejna xizmên xwe yên li Tirkiyeyê pîroz bikin di deriyê Serêkaniyê re derbasî Tirkiyeyê bûn. Kurdên bi armanca cejna xizmên xwe yên li Tirkiyeyê pîroz bikin hatin Deriyê Serêkaniyê saet di 08.00'î di derbasî serxetê yanî derbasî Serêkaniyê bûn.

Xizmên serxetê ku li Serêkaniyê li hêviya xizmên xwe yên binxetê rawestiyabûn li ber sînor dorek dirêj çêkirin. Welatiyên serxetê ku bi sebir xizmên xwe dipan bi coşeke mezin xizmên xwe pêşwazî kirin.Kesên ku gihiştin xizmên xwe alav û amûrên wan girtin û berê xwe dan gund û navçeyên xwe.


2 hezar û 556 kesên derbasî Tirkiyeyê bibin dê heta 48 saetan karibin li Tirkiyeyê bibînin. Welatiyên ji Sûriyeyê hatin ligel xwe çay û xelatên wekî din anîn Tirkiyeyê. **RIHA/DÎHA**



## Ji meteora Marsê jiyan derket

Li gorî lêkolînên NASA'yê, di meteora ku 13 hezar sal berê ketiye dinyayê de fosîl hene û di van de şopa zindiyan hatiye dîtin. Li gorî Daîreya Fezayê û Hewayê NASA, li pey lêkolînan hatiye dîtin ku li Marsê jiyan heye. Li gorî Navenda Fezaya Johnson, bakteriyên hatine dîtin Bîo-morf in. Ango li gorî rewşa derve dijîn.

Ji NASA'ê pispor Mackay, diyar kir ku derketiye holê ku ev meteor 13 mîlyon salan li fezayê geriyaye û 13 hezar sal in ku ketiye dinyayê. Di vê meteorê de bakteriyên wê demê dijîn hene û bi avê dijiyan. Pispor bewer dike ku vê gavê li Marsê av û ev cure bakterî û jiyan heye. Clinton dema ku serokê DYA'yê bû di 1996'an de gotibû ku, li pey lêkolînên meteora Marsê, fosîlên ku jiyan lê hatiye dîtin hene. Lê dihat gotin ku ev fosîl ên dinyayê ne. Lê îro ev rastî derket holê. Ev fosîlên bakteriyan 3.5 mîlyar sal berê jiyane. **NEW YORK**



## Sedemên qelsiya gogbaziya kurd

Ozan KILINÇ / AMED

Di nav gel de tê gotin ku ji ber nasnameya xwe gogbaziya kurdan bi pêş ve naçe. Di nav gel de sedemên qelsiya gogbaziya kurdî wiha hate ziman.

Bi awirekî rexnegirî gava ku mirov ji nêz ve li gogbaziya kurdî dinêre, bi gotineke din gogbaziya ku li deverên zimanê kurdî lê tê axaftin dinêre, kêmasiyeke herî balkêş bala mirov dikişîne. Wek tê zanîn, gog lîstineke pir sosyal e. Û ew reqabeta sosyal xwedî armac û bi mebestê ye lê kesên ku vê dilîzin piranî wek kurdekî nalîzin. Lê mixabin, cografyaya ku kurd lê dijîn, gogbaziya pûç dilîzin. Mirov ji çavê xwe bawer nake ku gogbaziya kurdî dilîzin. Bê armancî û bê karakterî xwe dide xuyakirinê.

### Bila wek kurdan bilîzin

Hefteya borî Diyarbakirspor li deplasmana Kayseriyê, li hemberî Kayserîsporê tek çû. Antepspor jî li mala xwe li hemberî Bursasporê tek çû. Lê tê gotin ku vê gava tekçûna her du tîmên kurdan ne ji ber sedemên gogbaziya bû, bela bê armacî û xwezayiya ku ji wê encamê diafiriya, bê karakteriya lîstika gogbaziya bû. Di nav gel de tê gotin ku eger gogbazên kurd, dema dilîzin bi ramana kurdewarî bilîzin wê bigihîjin armanca xwe.

### Bila gogbazên kurd bibin mînak

Maça DBB Dîskîspor û BeledîyeVanspor jî, ji wê kambaxiyê nesîbê xwe girt. Tîmên Batman, Mêrdîn, Riha werhasil tîmên bajarên kurdan di gogbaziyê de bê karakter û bê armanc hatiye dîtinê. Ji ber vê yekê gel dixwaze ku di nav gogbazên kurd de kesên mînak derkevin. Êdî bila ji têkçûnan re bêjin êdî bes e.

Çareseriya vê pirsgirekê di destê gogbazan de ye. Bila ji bîr nekin ku her tişt di mejî de diqede. Eger mejî bi kurdewarî bifikire dê sekeftin werin. Temsîleke kurdewarî bi xebatê dibe. Ev yek jî wê di dinyayê de bibe mînak. Kesên gihiştine asta herî jor hemû bi rengê mejiyê xwe fikirîne û serkeftî bûne. Çima, çiyê kurdan ji gogbazên bi navdar kêmtir e...

Di nav jiyana bajarên kurdan û di nava gogbazên ku di tîmên van bajara de dilîzin de tekiliyeke watedar nîn e. Kesên ku îro goga kurdî temsîl dikin ne xewdiyê çand û felsefeya kurdî ne û ji wan çavkaniyan sûdê nagirin.

Ew camêr ne xwe nû dikin û ne jî rê li ber hêzên nûdem vedikin. Jixwe ilmê wan ê gogbaziyê di mercen îroyîn de betal e û hê haya wan ji wê betalbûne nîn e.